

Agirê Newrozê  
Vênamire!


## NAVEROK



Düzungün Deniz: Li NÇM'ê bîranîna Mihemed Şêxo



Naci Kutlay: 'Bingeşa nasnameya kurdî wêjeya devkî ye'



D.S. Tizyan: Hinek berhemên nû derketî

## Ji Xwendevanan

DI dîroka her gelî de gelek rojîn bi nav û deng hene. Di dîroka Kurdistanê de jî ji van rojan yek jê Newroz e. Newroz, li hemberî koledaran serî rakirin û avakirina roja nû ya azad e. İro jî neviyîn Kawayê Hesinkar bi ronahiya berxwedana rêheval Mazlum Doğanîn li hemberî dagirker û axayan, Mezopotamyayê ber bi azadiyê ve dîbin. Ev agirê azadiyê yê pîroz bi berxwedana ciwanêñ welatê agir û rojê, roj bi roj ges dibe. Çiya û banî, deşî û zozan bi xwîna pakrewanan dibe ava jînê û li ser axa Medyayê diherike. Ew, vî warê şaristaniyê ji nû ve dîkin baxçeyê azadiyê. Em bi hêvî û sahiya wan rojîn pîroz, Newroza we pîroz dîkin.

GIRTYIYÊN PKK'YI/BARTIN

WEKİ hûn jî dibînin û dibîhîzin mêtîngîrîn tirk vê cejna mazlûman, cejna pîroz Newroz, dixwazin berevajî bikin; ji eslê wê dûr bixin. Ji ber ku gelê kurd xwe pê dinase û hisyar dibe, ji ber ku dewleta zordar, hin dil heye ku emelîn xwe yê qirêji li ser Kurdistanê bidomîne. Naxwaze ev cejn bi eslê xwe bê pîrozkarin.

Ji ber ku nikaribû qedexe bike, ev car idia kir ku qaso Newroz jî orf û edelîn tirkon tê. Ji wan were ye ku bi çend daxuyanî û belavok û afîşan dê Newroz bê guharîn, dê bibe. 'Nevruz.' Lî heke em neviyî Kawa bin, heke em neviyî Rustem Zal bin û heke em evîndarê welatê Mem û Zinê bin, em vê yekê ne dipejîrîn û ne jî li hember bêdeng dimînîn.

SERWEXT/ELIH



7

11

13

## Newroz û rengekî nîjadperestiyê

SAMÎ TAN

**E**v hefte bi çalakiyên Newrozê tê xemilandin. Li gelek cihêñ Kurdistan û Tirkîyeyê çalakiyên cur bi cur tê lidarxistin. Dil dixwaze ku ev cejn ji aliyê gel ve bi azadî were pîrozkarin, lê mixabin hêzên kedxwar rê nadîn pîrozbahîyeke bi vî rengî, ji niha ve dest bi pest û pêkutiyen kirine. Taybetiyeke dewleta tirk heye, dema nikare rî li ber tiştekî bigire, dest diavêje, çekeke jengarî; yanê naveroka wî tişti tê valakirin, bi awayekî nîjadperestî lê xwedî tê derketin. Her wekî çawa berê "Heke kommunîzm pêwist be, wê jî emê bînîn" digotin, niha jî dest diavêjin nirxên gelê kurd ên neteweyî. Pêşî li cejna Newrozê xwedî derketin, niha jî li rengîn neteweyî yêndî kurdî ên bi hezar salan xwedî derdikevin.

Di vê helwestê de rengî nîjadperestiya dewleta tirk veşartî ye. Ev curreyeke taybet a nîjadperestiyê ye. Li êrdima di bin destê komara tirk de çi tişt û kêsê ku dixwaze li ser piyan bi-

mîne, divê tirkbûnê bipejirîne. Bala xwe bidinê dema mirovekî/e afrîkî dibînin jî ala xwe pê dîbin maçkirin, an jî pê slogan "xwezî kesê ku bibêje ez tirk im' didin gotin.

Em kurd divê bi ser vê helwestê de herin, zorê bidinê ku wê biguherîn. Lewre heta ew helwest û nêzîktêdayîn neguhere, kurd nikarin-hebûna xwe bi dewletê bidin pejirandin. Di vî warî de divê em hinekî serîşik bin, li hemberî gefen şûrkêşen dagirkeran serî netewînin, gava xwe bi paş de neavêjîn.

Rast e, gelê kurd ne neteweperest e, biratî û wekheviyê dixwaze. Lî mixabin hê gelek tirk jî ji wekheviyê tirkbûna kurdan fêm dîkin. Dema devê xwe vedikin dibêjin: "Kurd û tirk, alevî û sunî çi ne em gişt di bin alekê de dijîn, em gişt tirk û misilman in." Ji misilmaniyê jî qesta wan mezheba hanefî ye. Lewre jî divê em bîşik û guman li kesen ku dibêjin, "Na-vênen me gelek in, lê paşnavê me Tir-

kiye ye" binêrin. Heke ew kes vê go-tinê li ser navê sosyalîstiyê bikin jî.

Tê zanîn ku siyaset hostatiyê dix-waze, divê mirov gavê xwe bi hos-tatî biavêje. Ji bo vê yekê jî hewce ye mirov hem xwe, hem jî yê li hemberî xwe baş binase. Mixabin ên li hemberî me kurdan ji helwesteke şar-ristanî fêm nakin. Ci gava ku tu aşî û biratiyê bixwazî ew zêdetir bi ser te de tê, ji wan werê ye ku tu qels ke-tiye, tu hew dikarî tiştekî bikî, lewe tu aştiyê dixwazî. Divê em jî li gorî vê rewşê gavê xwe biavêjin. Bo ni-mûne divê kes nikaribe ji niha ve sî-nor deyne ber mafê me yê çarenûsi-yê! Her wiha divê em jî helwesteke nerm li hemberî 'tirkît'ya ku ew li ser me ferz dîkin, nîşan nedin.

Di dawiyê de me divê bibêjin ku Newroz ji bo gelê kurd bûye sembo-la berxwedan û azadiyê, pêwist e em tu car wê bi dest gurgebozan ve ber-nedin. Bi tenê kesen ku doza aşî û azadiyê dîkin, dikarin li Newrozê xwedî derkevin. Ji wateya vê cejnê ya dîrokî û efsaneyî wê de tir, wate-ya wê ya siyâsî girîng e. Bi van hest û ramanan, em Newroza gelê kurd û gelên azadîxwaz pîroz dîkin û spasi-yênen xwe pêşkêşî kes û saziyên ku pîrozbahî jî me re şandine, dîkin.

## Ev ne dengekî ji rêzê ye

O.DERSILAVI

**H**inek dîkin, hinek jî dix-win." "Ma ga dike û ga dixwe?" Ev her du gotinê pêşîyan di jiyanê de gelek caran tê bî-karanîn (tê gotin)

Ga dike belê em (insan) dixwin. Ev zagona xwezayî (tabîî) çîqas adîlanê be jî tiştek tabîî ye û bêyî iradeya me dimeşse. Belê gotina dîtir "Hinek dîkin û hinek jî dixwin" bi awayekî sîtemkarî hatiye gotin. Berê civakê tev dikir û bi tevayî dixwarin. Pişti peydabûna pergala çînî (sîmîf) di nava civakê de ku hinekan, hinekîn din ji xwe re kirin kole, serf, râye û gundi wan tev de kirin û tev de xwarin. Sistem guherî, ica hinekan kir (xebitîn) û hinekan jî xwar. Kole xebitîn, efendiyîn wan xwar, gundi xebitîn, senyor û axayan xwar. Vê gavê jî karker dixebeitin, patron û sermayedar jî dixwin.

Pêşîyan ev sistem nepejîrandibin jî bi darê zorê dan pejirandin. Ji roja ku ava bû û heta niha li hemberî vê sistemê ne-razibûn û serhildan jî berdewam e. Serfiraz nebûn. Ji ber ku sebebêñ serfiraz-nebûna van serhildanî pir in, em zêde li ser nesekekin. Ev nerazibûna vê sistemê ji nav civakê dernekekiye û berde-wam e.

Dem derbas bû, sistem kevnar bû, demek dîtir hat hinek rabûn; gotin: Emê

Dîsa hêvî û gumana jar û rebena tefiyabû, melûl, melûl difikirîn. Di vê demê de me dît ku dengekî berz ji Zagrosan bilind bû. Me dît ku wî dengî li Cûdi, li Gebar, li Herekolê, li Sîpanê Xelatê, li Nurhaq, li Bagok, li Sinaxtê olan da.

vê sistemê biguhêrin, emê çîna rakin. Emê sistemekê nû ava bikin. Wê "Her kes bike û her kes bixwe, wê mirov bê-şer û bêpevcûn, bi biratî bi hev re bijîn, wê kes kesi ji xwe re neke dîl û kole. Bi kurtayî emê dînyayeke di nava aşî û azadiyê de ava bikin." Di serî de pir ke-san tiştek ji van fêm nekir. Yeko, yeko mirovîn zana û çeknas xwe li wan gitin. Ji ber ku daxwaza wan a jar û rebenan bû, roj bi roj kom bûn û rîexistinê wan jî zêde bûn. Gelek gelên dînyayê bi rîberiya fîkir û ramanêñ wan azadiya xwe bi dest xistin. Tesîra bayê azadiyê li hemû der û welatan çê bû, me dît ku pê re tirsek kete dilê zalim û mijokan. Burjûwazî ji ber van egeran dest bi êrişan kir. Bi ser şoreşeran de çûn, carinan bi bertîlê, carinan bi fenan; hinek ji rî ve-gerandin, hin jî kirin hevalbendê xwe. Bi diz û keleşîya xwe rî û şop şolî kirin. Gelek egît û leheng xistin dafik û kemînan. Ew jî hev re kirin dijmin, hêvî û gu-manîn wan şikandin. Pêl û rîdanêñ pola nerm kirin û rî li ber wan winda ki-rin. Ev rewş li welatê me jî bi vî rengî bû. Dîsa hêvî û gumana jar û rebenan te-fiyabû.

Di vê demê de me dît ku dengek berz

Heta demekê gelek jî dost û dujmîn pê kenîyan û gotin: "Tuyê bi vî halê xweyî perîşan çawa bîbî hêviya me û ya gelê xwe." Belê bandora vî dengî ew qas dijwar bû ku di demeke kin de dost û dijmin zû ji xew rakirin, ê bi şeref û narmûs lê bi cesareta xwe kêm, li ola (dost hevalê) xwe vegeryan û bûn ar û pêt. Hişyar bûn, gotin: "Ev deng, ne weki her car e, ev deng dengekî cuda ye." Tîrs û xof ket dilê wan, vî dengî mêjîyê dijminan çelq kir. Ew din û har bûn, kef bi devê wan ket, nema zanibûn ku wê çi bikin.

Ev jî bi me dide zanîn ku ev deng ne dengekî ji rêzê ye. Ji bo mîletê kurd bin-geha jiyanê ye.



KOMELEYA Mafen Mirovan (İHD) rapora xwe ya der barê İhlalkirina mafen mirovan a meha reşemiyê weşand. Li gorî raporê 7 kes bi faîlî meçhûlan hatine kuştin, 6 kes di bin çav de û bi işkenceyê hatine kuştin.

Di şer de 43 kes hatine kuştin. Ji bliî van 8 sivîl hatine kuştin û 8 ji birîndar bûne. Dîsa 7 kes di bin çavde wînda bûne, 25 kes hatine işkencikirin, 964 kes ketîne binçav, 44 kes hatine girtin, 2 gund hatine valakirin, 15 weşanîn muxalîf hatine berhevirkirin, 54 sal cezayî hepsî li rojnamevan û weşankaran hatîye birîn, 32 rojnamevan hatine binçavkirin.



**HELSINKI WATCH:** Li Tirkîyeyê İhlalkirina mafen mirovan didome. Komîteya Çevdîrî ya Mafen Mirova rapora xwe ya li ser İhlalkirina mafen mirovan a li Tirkîyeyê weşand. Li gorî raporê hikûmata Refahyolê sozên ku heta niha ji bo mafen mirovan daye neanîne cih û hê jî li Tirkîyeyê mafen mirovan bi awayekî berfireh tê İhlalkirin.

Her wiha komîteyê ji rayadarêne dewleta tirk daxwaz kirin ku bi giranî li ser heft xalênu wan kîf kiriye, mafen mirovan neyên İhlalkirin. Ji van bi giranî rakirina Rewşa Awarte a li Kurdisanê û rakirina tadeyên li ser rîxistinîn sivîl, têne xwestin.

## NÛÇE

# Agirê Newrozê venamire

Ji Kovara Nûbiharê Ali

**Karadeniz: "Dewlet dixwaze gel ji pîrozkirina Newrozê dûr bixe. Pişti ew qas kuştin û zordariyê kes nema bawer dike ku ev cejna dewletê ye. Newroz ji destpêkê heyâ iro roja azadiyê ye.**

**Xwedîderketina dewletê ya li Newrozê dişibe kesen ku eleqeya wan bi İslamiyetê re tune ye, lê rojiye digirin."**

Polîtikayêne dewleta tirk yêni li diji kurdan bi tenê bi kîfî tişteki hatine. Wan polîtikayan bes pêkanîna (mizah) kurdan xurtîr û dewlementir kirine. Dewleta tirk niha ji pişti hezar salan bi xwe hesiya û dibêje 'Newroz cejneke neteweyî ya tirkân e.'

Gel û netewe hest û ramanîn xwe yê herî hêja û bedew bi stranîn xwe tînin zimên. Dilîn, şahî, eş û janîn neteweyan herî zelal xwe di müzîka wan de didin der. Gava ku mirov li stranîn kurda: dinêre bi sedan stran li se Newrozê hatine gotin û hê jî têne gotin. Lî, di zimanê tirkî de heyâ iro ji bo Newrozê stranek nehatîye gotin.

Di rojhilata Navîn de gelek gel û netewe cejna Newrozê pîroz dîkin. Lî Newroz ji layê kurdan ve bi motifîn ramyâri (siyasi) tê xemilandin.

Gelo dewlet bi kîjan armancan dixwaze naveroka Newrozê berevajî û vala bike? Tirsa dewletê ya rastin ci ye? Ma dewletê di vî karî de wê bi ser bikeve? Ev çalakiyêne dewletê ji bo çareseriya pîrsîrêka kurd nişana politikayên çawa ne? Li ser vê mijarê dîtin û ramanîn hin kes û saziyan girtin.

### Dewlet dixwaze Newrozê dejenerê bike

Cigirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Sedat Yurdaş, der barê armancan dewletê ya pîrozkirina Newrozê de, bal kîşand ser berxwedanê gel ya li hemberî çew-sandin û zordariya dewletê. Yurdaş da zanîn ku gelê kurd tevi ew qas çawsandan û zordariyê dev ji Newrozê bernedaya ji ber vê yekê dewlet bi van kirinan dixwaze naveroka Newrozê vala bike. Yurdaş girêdayî van gotinê xwe da zanîn ku êdi dewlet Newrozê bi awayekî fermî pîroz dike, ji aliyeke ve ev qebûl-



kirina rastiya gel e.

Yutdaş, li ser qedexebûna Newrozê ya li hin deveran ji diyar kir ku dewlet bi vê yekê dixwaze ku Newrozê asîmîle bîke.

Yurdaş ji bo armancan rastin ay dewletê ji da zanîn ku dewlet dixwaze Newroz bi manaya xwe ya hezar salan neyê pîrozkirin.

Cigirê Serokê Giştî Yurdaş daxuyand ku, dewlet nema dikare Newrozê ji rastiya xwe dûr bixe.

### Çalakiyêke li diji tevgera kurd

Ronakbir û Rektörê Zanîngeha Azad Fikret Başkaya, çalakiya dewletê ya ji

bo pîrozkirina Newrozê, di rastiya xwe de wekî çalakiyêke li diji tevgera kurd nirxand û da zanîn ku dewlet bi kirinê vî rengî ji aliyeke ve jî dixwaze çareseriya xwe bi kurdan bide pejirandin. Başkaya li ser vê yekê wiha axivî: "Lîstina bi Newrozê, di rastiya xwe de daxwaza manûpûlekirina tevgera kurd nişan dide. Lî, di vê qonaxê de ez ne bawer im ku wê bi ser bikeve."

Mamoste Fikret Başkaya da zanîn ku dewleta tirk ji mîj ve xwedîyê helwesteke bi vî rengî ye li hemberî tişten ku nikare pê re serî derkeve.

### Ev çalakiyêke kontrayî ye

Xebatkarê Kovara Jiyana Rewşen Cemil Denli ev helwesta dewletê wekî çalakiyêke kontrayî bi nav kir û da zanîn ku armancan dewletê bindestkirina çand û neteweyâ kurd e. Denli da xuyakirin ku dewlet dixwaze bi awayekî kontrayî Newrozê bike 'faîlî meçhûl'.

Denli da zanîn ku Newroz ji bo kurdan sembola xwedî-derketina li nasnamaya neteweyî ye. Cemil Denli afîrandina mîtosa Kawa wiha rinxand: "Gel gava ku dikevin tengasiyê qehremanan diafirin û wan qehrîmanan ji xwe re dîkin meşale û di riya wan de dimeşin. Bi vî awayî gel xwe ji tengasiyan xelas dîkin. Ev pîwîstiyek e civakî ye. Niha ji şervanîn li ser axa welêt kawayê nûdem in."

### Ev kirin rengê çare-seriya dewletê nişan dide

Gerînendeyê Giştî yê Rojnameya Hêvî Fehim Işik, daxuyand ku gelê kurd digel ew qas zilm û zordariyê têkoşîna xwe bi pêş ve bîriye. Ji ber vê yekê dewletê dest bi 'asîmîlasyona spî' kiriye û li çand, dîrok û edebiyata kurdan xwedî derketiye. Işik bi bîr xist ku di Rojhilata Navîn de gelek netewe Newrozê pîroz dîkin, lê tirk gelekî dûrî vê cejnê ne.

Rojnameger Fehim Işik gotina wiha bi dawî anî: "Berê ji binî ve hebûna kurdan red dikirin. Edî nikarin hebûna kurdan îñkar bikin. Îcar dixwazin hebûna kurdan li gorî daxwazên xwe bîpejirinin û bidin pejirandin. Ji ber ku ji bîlî guherîna polîtikayêne dewletê tu rî tune ye, mîcûr in ku biguarin."

### Newroz sembola azadiyê ye

Ji kovara Nûbiharê Ali Karadeniz pişti ku sedema helwesta dewletê eşkere kir, da zanîn ku dewlet di qada navneteweyî de diket tengasiyê, lewre jî xwast vê cejnî meşrû bike û xwe ji tişten ku çedibûn rizgar bike û got: "Bi vê kirina xwe dewlet dixwaze gel ji pîrozkirina Newrozê dûr bixe. Pişti ew qas kuştin û zordariyê kes nema bawer dike ku ev cejna dewletê ye. Newroz ji destpêkê heyâ iro roja azadiyê ye. Xwedî-derketina dewletê ya li Newrozê dişibe kesen ku eleqeya wan bi İslamiyetê re tune ye, lê rojiye digirin."

MAZLUM DOĞAN

# Piştrevaniya Navneteweyî Ji bo Azadiya Welat

**Ev nivîs, di kovara  
almanî Kurdistan Brief  
de derket. Nivîs hel-  
westa dewleta tirk a li  
dijî zimanê kurdî û  
weşanên bi kurdî, bi  
taybetî Welat, Welatê  
Me û Azadiya Welat  
tîne zimên. Nivîskarê  
nivîsê MARLON WERNER e û  
nivîs bi almanî ye.**

**Ji ber nebûna kesen ku  
bi kurdî û almanî baş  
dizanin, nivîs pêşî li  
tirkî wergerandin û  
pişt re jî METIN AKSOY ew  
li kurmancî wergerand.**

Welat, Welatê Me, Azadiya Welat an jî helwesta dewleta tirk li hemberî weşanên kurdî. Li Stenbolê di pûşpera sala 1996'an de buroşûrek li kesen ku besdari Konferansa HABITAT II bûbûn, hat belavkirin. Ev buroşûr li ser daxwaza dewletê hatiye amadekirin û bi navê "Di Rastiya Tirkiyeyê de Kurd û Terorâ PKK", di buroşûre de qaşo li ser mafen mirovan bi awayekî berfireh hatiye rawestin û di beşike broşûre de jî bi sernavê "Li Tirkiyeyê zimanê kurdî qedexe ye?" ji rewşa zimanê kurdî re hatiye veqetandin û Azadiya Welat mînak hatiye nişandan. Lê di wê buroşûre de astengiyen li berî weşan û belavkirina rojnameyê bi awayekî qurnazî û bi qestî hatiye veşartine.

Azadiya Welat dûvajoya Rojnameya Welat e ku di 22.2.1992'an de dest bi weşanê kiribû. Vê rojnameya hefteyî pişti hejmara 115'an ji ber pest û pêkutiyen dewletê weşana xwe da rawestandin. Rojname di 20.11.1994'an de carê din bi navê 'Welatê Me' derkete holê. Tadeyên dewletê wisa li ser rojnameyê zêde bûn ku weşana vê rojnameyê ji pişti hejmara 46'an hate rawestandin. Ji 21.1.1996'an vir ve rojname bi navê Azadiya Welat weşanê dike.

Ev rojname li Tirkiyeyê û li Kurdistana Tirkiyeyê rojnameyeke hefteyî û tekane rojnameya xwerû bi zimanê kurdî ye. Bi zimanê kurdî rojnameyeke ku rojahe weşanê dike vê gavê nîn e. Navena Rojnameyê li Stenbolê ye. Li ber weşanê kurdî pişti bi salan politikayê asimilasyonê û pêkutiyen bûye asteng. Di destpêkê de 27 hezar firotina rojnameyê eleqeşa xwendevanê zimanê

kurdî destnîşan dike. Ev hejmar heke bi weşanên tirkî yê heftane re were rûberkirin hejmareke pir mezin tê qebûlkin.

Di qada navneteweyî de hatiye qebûlkin ku pêwistiya parastina ziman, çand û nasnameya hindikahiyen heye. Ew parastina zimanên hindikahiyen hîmê bingehîn ya seretaya parastina hindikahiyen

e. Rewş a weşanên bi kurdî helwesta Tirkiyeyê asimilekar jî derdixe holê.

**Cend nîşeyên  
dirokî: Dîrok  
û şop**

Di destpêka sedsalê de li Misrê, li Îngilista- nê û

Swêdê bi zimanê kurdî bi awayekî peryodîk kovar û rojname dihatin çapkirin. Bi piyanî li ser mijarêñ olî dihat nîşandin. Di dema di Împaratoriya Osmanî de jî berhem û weşenê kurdî heta avabûna komara tirk a di bin rîberiya Atatürk de heta sala 1923'an hatin weşandin. Ji bar doktorîna dewleta tirk ya nîjat-peresti- yê zi- m a - n ê

kur- dî di sa- lêñ pişt re bi awayekî veşarî we- şanên kurdî dixistine Tirkiyeyê. Mirov ji vê re mînaka rojnameya Hawar ku li Şamê ji aliye rewşenbirêñ kurd ve hatiye weşandin nişan bide.

Piştî sala 1960'i ku cuntaya leşkerî

çêbû zagineke bingehîn a ku hinekî aş- tixwaz dixuya derket. Rewşenbirêñ kurd xwestin zimanê kurdî bi wan bidine qebûlkin û weşanêri bi navê kurdî û naveroka wan tirkî weşandin. Nivîskarê rojname û kovaran hin caran cesaretâ kirin ku şîr û stranê kurdî

di rûpelên çand û hunerî de biweşînin. Her wiha nivîskar û rewşenbirê kurd

ê nav- d a r M u s a Anter ku di salêñ 1960'i de li Uşakê İsmet İnönü ji aliye gel ve tê protestokirin helbestekê dinivîsîne, naveroka helbestê gel rexne dike. Tevî ku tu kes li naveroka helbestê nanihêre Musa Anter xayîn hate flankirin. Musa Anter di 20.9.1992'an de ji aliye hêzînen tarî ve hate kuştin. Keseki ku ji bo serbestiya zimanê

Berî darbeya 12'ê rezbera 1980'yi di pratikê de qedexeya li ser zimanê kurdî jixwe hebû, lê piştî cuntayê ev qedexe bi madeya 2932'yan zeximkirin. Qanûna bi nav û deng, Qanûna Têkoşîna bi terorê re ku hate çêkirin ew qanûn ji holê rabû û bikaranîna zimanê kurdî nîşandin û weşanvanî bi awayekî teorîk serbestî bi dest xist. Di Zagona Bingehîn a Tirkîyeyê de zimanê tirkî hî jî zimanê fermî ye. Wekî gotina Serdozgerê Komarê yê Amedê heke zagon tekûz bîkevin pratikê wê derkeve holê ku zimanê kurdî qedexe ye. Bi vî awayî perwerdehiya bi zimanê kurdî ji aliye rêvîberen dewleta tirk ve tê redkirin.

Bi vî mabestê, armanca kesen ku rojnameyê derdixin vejiyandin û pêşvebirîna zimanê kurdî ye ku ji ber qedexe û asimilekirina bi sedan salan qismen hatiye jibîrkirin. Ew ji lêkolinê akademîyên kurdî û bi taybetî jî yê Başûrê Kurdistanê sîdî werdigirin. Bi vî awayî ji bo ku gelê kurd bi dewlemendiya zimanê kurdî bihesînin, xebatê dike. Bi her sê zaravayê zimanê kurdî: Kurmancî, za- zakî û soranî weşanê dike.

Naveroka rojnameyê bi giştî li ser dirok, civak, politika, çand û jiyanâ gelê kurd e. Xebatkar û nivîskarê rojnameyê wekî karmandan dixebeitin û rî li ber kesen ku bixwazin binivîsînin jî vekirîye. Her kes dikare binivîsîne û xwe tê de ifade bike. Der heqê rojnameya Welat de sê doz hatine vekirin. Berpirsê Karê Nivîsaran Mazhar Günbat ji her dozêkê 24 meh cezayê hepsê û bi milyonan jî cezayê peran xwar. Sê doz jî li rojnameya Welatê Me hatine vekirin, Berpirsê Karê Nivîsaran yê Welatê Me Mehmet Gomsiz jî sê sal cezayê hepsê û 500 milyon jî cezayê peran lê hate birîn. Û cezayê mehekê ya girtina rojnameya Welat hate dayin. Li aliye din Berpirsê Karê Nivîsaran yê Rojnameya Welatê Me Mehmet Gomsiz ji ber ku di dadgehê de xwest bi kurdî biaxive cil rojî di girtigêhê de ma. Axaftina wî jî di belgeyê mehekemeyê de bi vî awayî hatiye nîşandin: 'Bersûc bi zimanê kurdî û nîşandin axivî'. Pişti vê bûyerê Mehmet Gomsiz di dadgehê de eyî ifade bi zimanê tirkî da û hate berdan. Li gorî peymanê navneteweyî mafê bersûcan heye ku bi zimanê xwe yê zikmakî ifadeya xwe bîdin, lê rewişteke dadgehêñ tirk heye ku di dozen kurdan de wergêr naynin. Li gorî mantiqê tırka anîna wergêr tê wateya qebûlkinâ zimanê kurdî. Lewre jî naxwazin ku bersûc bi zimanê xwe berrevâniya xwe bikin.

# Dahûrîna peyvan (10)

**D**i destpêkê de min bawer nedikir ku ez dê dahûrîna peyvan ev çend dirêj bikim. Ez çiqas bi ser de dicim ew qas ji ez bi mijarê ve tême girêdan û ez li peyvên din jî vedibim. Me çend peyvên din jî ji hev kirin û ew dahûrandin.

**mak:** Peyv ji du hêmanan, ji /ma/ û /k/yê hatiye pê. Peyva hîmî /ma/ jixwe navdêr e bi alikariya parkîta (paşgîra /k/yê careke din jê navdêr hatiye çêkirin. Her çiqas iro di kurdancî de /ma/ bi se-re xwe neyê bikaranîn jî ew ji aliye wateyê ve di şuna /da, dê/ de ye. Ew peyv, ango /ma/ di kirdkî (kîrmancî, dimîlkî) de pir tê bikaranîn; çendî di vî zaravayê kurdî de peyva /da/ jî bê bikaranîn.

Di kurdancî de /mak/ bêhtir ji bo heywanen ku dizên û hêkan dikan tê bikaranîn.

Em li ser parkîta /k/yê jî hinek agahî bidin. Ev parkît pir nayê dîtin, lê belê dîsa jî em bêyî ku zorê bibînin lê rast tê. Nimûne:

bira û birak bin+kiras+  
rê û rîk ber+dil+  
k

**keyxe:** Ev peyva hanê ku wekî keyxo û kêfo jî tê bilêvkirin, ji /key/ û /xwe/ pêk hatiye. Di kurdîya kevn de /key/ di wateya qral de ye; /xwe/ jî cînavk e.

Keyxwe, tê wateya keya, ango muxtar. Peyva /keya/ jî, peyveke hevedudanî ye; ji /key/ û ji parkîta /a/yê çêbûye. Ji bo parkîta /a/yê çend nimûne:

zan+a, mal+a, kar+a, bez+a ...

Her wiha dîsa peyveke, hevedudanî ku ji /key/ hatiye çêkirin heye: keyxu-da. Ev peyv jî tê wateya kehyaya farisî û

seyîsa erebî. Em vê jî bibêjin ku /keh-ya/ya farisi û /key/ya me ji aliye teşeyê ve yek e, lê belê wateyê wan ji hev cu-da bûye.

**desmal:** Ev peyv ku rastiya wê /dest-mal/ e li devera Farqînê jê re /kemnîk/ tê gotin, ji du hêmanan çêbûye; ji navdêra /dest/ û ji parkîta /mal/ e. Li vir tiştê ku em dê li serê rawestin parkîta /mal/ e. Ev parkît ji lêkera /malandin/ê hatiye. Teşeyekê ve lêkera hanê jî /malaştin/ e. İcar parkîta /mal/ ji raweya lêkera fermanî hatiye bidestxistin. Nimûne:

*Bi+mal+e; li vir /bi/ ya fermanê,*

**P**eyva "gustîrik" ji sê parçeyan hatiye pê  
bi awayen wekî gustîlk, gustîl, gustîlî û gustîrik jî tê  
bilêvkirin. Her wiha navekî wê jî hungulîsk e. Ev peyva  
hevedudanî ji pêrkîta /gû/, ji navdêra /stêr/ û ji parkîta  
/ik/ê hatiye pê.

/mal/ koka raweya fermanî û /e/ jî qerta-  
fa lêkera bûnê ya kesê sêyemîn ê yekj-  
mar e.

Bi qonaxa demê re /mal/ êdi bûye  
wekî parkîtekê. Lê tiştê heye, ci peyva  
ku bi alikariya wê hatiye çêkirin têkiliya  
wê bi paqijîye re heye. Jixwe /malandin/  
û /malaştin/ tê maneya pak-kirin, paqij-  
kirinê. Ji bo parkîta /mal/ ê nimûne:

*Pêş+mal an jî pêş+mal+k*

**dezgîn:** Ji du hêmanan çêbûye; ji  
/dest/ û ji parkîta /gîn/ e. Di kurdancî de  
mirov pir leqayî parkîta /gîn/ e dibe. Ji  
ber ku navdêra /dest/ hewceyî ravekirinê  
nake, emr dê li ser /gîn/ e bisekinin. Çawa  
me got, /gîn/ parkît e û pê gelek peyvên  
ku hatine çêkirin hene. Mînak:

xwez+gîn, lez+gîn, miz+gîn,  
xem+gîn, nav+gîn, tê+gîn....

**gustîrk:** Peyv ji sê parçeyan hatiye  
pê û bi awayen wekî gustîlk, gustîl, gustîlî  
û gustîrik jî tê bilêvkirin. Her wiha  
navekî wê jî hungulîsk e. Me got ku  
/gustîrk/ ji sê hêmanan çêbûye, em wê ji  
hev dahûrin: Peyv ji pêrkîta (paşgîra)  
/gû/, ji navdêra /stêr/ û ji parkîta /ik/ e.  
Dibe ku ev dahûrîn ji hinekan re seyr  
(ecêb) were; em pêşî ji bo pêrkîta /gû/ yê  
hin nimûneyan pêşkêş bikin:

*gû+hesin, gû+sinc, gû+stêrk...*

Ji bo bibîrxistinê em cen mînakan ji

wekî stêrkan.

Dibe ku navê gustîrkên bêqaş, yên  
xelekî jî hungulîsk be.

Ji bo ku em mijara dahûrîna /gustîr/ ê  
hîn bêhtir ronî bikin, em dê peyvekê hil-  
dine destê xwe û bidine xuyakirin ku ew  
peyv çawa hem ji aliye wateyê ve û hem  
ji, ji aliye teşeyê ve bi qonaxa demê re  
guheriye. Peyva me /kun/ e; ew iro mîna  
/qûl/ jî tê bikaranin. Ji hêla din ve peyva  
/qûn/ jî heye. Gava em van her sê pey-  
van bidine ber, em dê bibîmin ku ji aliye  
teşeyî ve dirûvî van hev nagire, lê di  
rastiya xwe de her sê jî yek peyv in. Be-  
re bere guherîn tê de çêbûye, hem ji hê-  
la teşe û hem jî ji hela wateyê ve.

/kun/ û /qûl/, ji aliye wateyê ve yek  
in, em ji layê teşeyî ve li ser van biseki-  
nin. Di zimanê me de dengen /k/ û /q/yê  
bi hev û dengen /n/ û /l/yê jî bi hev digu-  
herin. Ji bo herdyan nimûne:

*kam û qam, silk û silq  
nînîn û livîn, antax û altax*

Di peyvan de îcar em vegerin ser  
peyvên /qûn/ û /kun/ e. Ji ber ku me der  
barê guherîna dengen /k/ û /q/yê bi hev  
û /l/ û /n/yê bi hev, agahî dan em dê te-  
nê li ser bihevguherîna dengen /u/ û  
/u/yê rawestin. Nimûne: hûn û hun, bi-  
hurtin û bihurtin, stu û stû, guman û  
gûman...

Di peyvan ravekirina de xweş diyar  
dibe ku her sê peyv di destpêkê de ji her  
alî ve yek bûn e û pişt re li wate û şewe-  
yên din dageriyane.

ZANA FARQÎNÎ

## Bîranîna Mihemed Şêxo

HELÎM YÜSIV



**B**erî demekê, di roja 9'ê adarê de, li  
Zanîngeha Helebê komcivîneke xort û  
qîzen kurd saz bû, hejmar gihişt cil kesî,  
ev komcivîn li malekê ji bo salvegera 8'an miri-  
na hunermend M.Şêxo bû. Pişti ku jînenîgeriya  
wî hate xwendin, "Ecewîd" çend stranê M.  
Şêxo gotin û gotara Koma Xanî ya Wêje û  
Çanda Kurdî hat xwendin. Pişti re her du huner-  
mendan Mistefa Osê li ser kemanê û Ehmedê  
Çep li ser Bizqê çend awazên şérîn pêşkêş  
kirin. Komcivîn bi çend stranê dengbêj  
"Rêber" qedîya. M.Şêxo, di sala 1948'an de li  
gundê Xecokê li herêma Qamîşlo hatibû  
dînyayê û li vê dînyaya xinîz cil û yek sal di  
teqereq û êşê de derbas kirin, hetanî ku  
nexweşîya bêbext sala 1989'an di 9'ê adarê de  
cendekê wî spart mezelê Hilîlikê û zarokê  
xwe "Felek û Brehîm û Birûsk" spartin bahoza  
bêkesiyê. Bi rasîf ev xorîn ku ev bîranîn li dar  
xistin hêjayî spasiyê ne, lê tevî wilo jî rî li ber  
gelek pirsên bi êş û azar vebibûn. Çima ev  
hezkirina germ di jiyanâ hunermend de nayê

zimên. Çima xelkên me ji laşan tenê hez dîkin.  
Çima em ji miriyan tenê hez dîkin. Ev dijminayî  
bi saxan re ji bo ci ye? Çima di civaka me de  
mirovê biserkebi dijmin û zimandîrîjîyê tê  
dorpêckirin? Şaxenê vê babetê xwe berdidin  
meydana têkiliya hunermend bi xelkê re. Ji bo  
ronîkirina vê pirsgirêk emê du wêneyan bidin  
ber çavan.

Psikolojiya gel û hunermend di jiyan û miri-  
na wî de. Di dîroka me de tê zanîn ku "Gihayê  
hewşê tal e" ango mirovekî biserkebi, balkêş  
be; ci di warê huner de, ci di warê tore û  
nîvîsandinê de be xelkê me bi ci çavî lê  
dînîrîn? Huner û nîvîsandin bi xwe yan şerm e  
yan jî dînbûn û karê kesê bêkar e. Ew pîr caran  
tawanbar e, gunehkar e û navê wî bi neqencî tê  
zimên. Li hemberî hunermendê ji derveyî rêx-  
istinê konevanî, dema çeka siyaset û  
konevaniyê tabî bû, nema dikaribûn bigotana  
ew noker e, dibêjin ew bêsinc e (bêexleq) bê  
mejiyekî saz e û ji jiyanâ gel dûr e, rûmetâ  
civak û xelkê nas nake. Ango çeka bêsinciye li  
diji wî bi kar tînîn, sedem ew e ku kîfa xelkê  
me ji biçükkirina mirovê dilmezin re tê. Nikarin  
mirovekî bejnibilindî di nav xwe de sax bibînin,  
çimkî ev bejnibilindî dibe problem, dema kinbû-  
na bejnîn wan dide xuyakirin. Ne ku dixwazin  
bejnîn bilind zêde bibin, belê bi hemû çek û  
hêza xwe dixwazin wê bejna bilind bişkinin,  
kesen bejn bilind bişkinin, nav û dengê wan  
hildiweşin. M.Şêxo yek ji van ên bejnibilind

bû. Yek ji van ên ku di jiyanâ wî de ji bin  
çengen wî û ji bêrîkên wî dijmin diweşîyan.  
Mirov kûr binêre wê bibîne ne tenê dagirkir  
hunermend û nîvîskarîn me dikujin belê gel bi  
xwe jî beşdarî vê kuştînê dibe. Kuştîn ew e  
dema ku nîvîsar û pîrtûkên nîvîskarekî me  
neyen xwendin. Dema ku bi hezaran ji gelê me  
hebin ku dikarin bi milyonan pere û dollaran li  
ser çixarê û çimkî spî û solêñ xweşik birjînîn,  
lê pîrtûkê buha bibînin. Dema mirovek huner  
û xweşikbûnê biçîne û dijminayî û sersaryê  
biçîne. Gelo wê rewşa vî mirovî çawa be. Ev  
rewş duh ya M.Şêxo bû û iro ya me ye. Lê belê  
mirina hunermend bobelat bi xwe ye. Wêneyê  
duduyan ev e: Pişti mirina hunermend û  
rewşenbir guhertînê seyr û mezin di psikolo-  
jiya xelkên me de çedîbin. Ew bi xwe yê ku di  
jiyanâ xwe de ne tiştê û bêsinc û bêniyx bû, di  
mirina xwe de, ji nişka ve dibe şehîd, mezin  
dibe, dibe leheng û bi hezaran desten ku di  
jiyanâ wî de kevir lê dîbarandin cenazeyen wî  
hildidin jor û wî dîkin pêxemberê gel.

Gelo ku em carekê tenê di jiyanê de li hev  
du xwedî derkevin ne çetir e ji hezar caran lê  
xwedîderketina pişti mirinê. Daxwaza me ew e  
ku ev roj bibe bangeke bilind ji bo ku em  
carekê din hunermendê xwe yê sax bi  
"celta" nekujin û pêwist e ji Bavê Felekê re bê  
gotin, hetanî ku em hebin wê dengê te hebe.  
Tu sembla şîna me yi.

# Li gorî rapora MGK'ê nifûsa kurdan

**Dewletên ku Kurdistan li hev par-kirine, heta niha di hejmarten de nehiştine ku hejmara rastin a gelê kurd derkeve holê. Lewre li gorî wan kurd an tirk in, an faris an jî ereb in. Lî ew dewlet li ser nifûsa kurdan raporê veşarî amade dîkin û ji bo ku rîjeya zêdebûna nifûsa kurdan kêm bikin.**

SAMI BERBANG

Kurd li ser rûyê cihanê wekî gelê herî zêhî bêdewlet tê binavkirin. Li hejmara kurdan li gorî hinekan bi giştî 20 milyon e, li gorî hinekan jî li dora 40 milyonî ye. Seda dema vê yekê jî tercîhên siyasi ne. Lewre dewletên ku Kurdistan li hev par-kirine, heta niha di hejmartinan de nehiştine ku hejmara rastin a gelê kurd derkeve holê. Li gorî wan kurd an tirk in, an faris an jî ereb in.

Lî ew dewlet li ser nifûsa kurdan raporê veşarî amade dîkin û ji bo ku rîjeya zêdebûna kurdan kêm bikin, li hin çareyan digerin. Çend mehan berî niha Lijneya Ewletiya Neteweyî (MGK) ya Tirkiyeyê raporek amade kiribû, di vê raporê de li ser nifûsa kurdan wiha dihat gotin: "Rîjeya zarakanînê û zêdebûna nifûse li herêma ku kurd lê dijîn pir bilind e. Ew rewş digel xurtbûna neteweperweriya kurdan li hundir û li derive, dikare hevkêşeya nifûse ya Tirkiyeyê xera bike û di dahatûyeke dirêj standina bacê."

Digel vê rewşê gava neteweperweriya kurdan jî derkeve pêş, beramberî nifûse wê hejmara mebûsên kurd ên di meclîsê de jî zêde bibe, ew jî dikare encameke xerab derxe meydanê. Lewre jî pêwistî bi kampanyaya plankirina nifûse heye. Divê em dest biavêjîn bergiriyê radikal ên mîna ji malbatêñ kêm zarok re prîm û ji malbatêñ pir zarok

Tablo 1

Nifusa texmîni (1993)			
Welat	Nifusa giştî	Nifusa kurdan	%
Iran	61 milyon	6.1 milyon	%10
Iraq	19 milyon	4.4 milyon	%23
Suriye	13.2 milyon	1.1 milyon	%8
Tirkîye	60 milyon	13 milyon	%22
YDS		500 hezar	
Giştî		26 milyon	

Em nirkandinên siyasi yê vê raporê deynin aliyeke, hewl bidin ku nifûsa kurdan a li Tirkiyeyê ji raporê derxin.

Tê gotin ku niha nifûsa Tirkiyeyê 65 milyon e. Rîjeya zêdebûna nifûsa Tirkiyeyê salê % 2.3 ye. Her wiha rîjeya zêdebûna nifûsa kurdan salê %3.3 e. Li

Tablo 2

Li herêman rîjeya nifûsa kurdan		
Herêm	1965 (%)	1990 (%)
Marmara	1.24	6.09
Ege	0.36	3.93
Bahra Spî	4.98	8.95
Anatola Navîn	4.13	5.53
Bahra Reş	0.51	0.50
Rojhilat	38.87	41.96
Başûrê Rojhilat	64.24	64.98

gorî hesabê MGK'ê nifûsa Tirkiyeyê wê piştî 13 salî bibe 84 milyon, % 40'ê wê dike 34 milyon. Ji ber ku nifûsa kurdan wê piştî 13 salî ji sedi 33 zêde bibe ku ew jî 11 milyon, dema mirov vê hejmara ji 34 milyonî derxe, nifûsa kurdan a iro derdi keve rastê, yanê 23 milyon.

Li gorî vî hesabî hejmara ku lêkolînerên kurd derdixin jî gelekî hindik e. Bo nimûne, Serokê Enstituya Berlinê birêz İsmet Şerîf Wanlı di nivîsa (Between Europe and Asia The Kurdish Question) xwe ya ku di hejmara 3'yan a kovara Lêkolîn de derketiye, nifûsa kurdan bi giştî wekî 34 milyonî nîşan dide. Li gorî hesabê wî li Tirkiyeyê hejmara kurdan 18 milyon e. Her wiha li gorî hejmara ku ew dide, li Iranê 8

milyoh, li Iraqê 4.5 milyon û li Suriye jî 1.5 milyon kurd dijîn.

Li aliye din rapora 'Minority Right Group International' a bi navê "The Kurds" ku ji hêla David McDowell ve hatiye nivîsin hejmara kurdan wekî 26 milyonî destnîsan dike. Li gorî hejmara ku di vê raporê de cih girtine di sala 1993'yan de li Tirkiyeyê ji 60 milyon însanî bi tenê 13 milyon kurd in. Li gorî vî hesabî kurd % 22 nifûsa Tirkiyeyê pêk tînin (Tablo 1). Her wiha li gorî raporê rîjeya zarakanîna kurdan li Tirkiyeyê salê ji hezarî 27.5 û ya tarkan ji hezarî 14.9 e. Her wiha tabloya ku di vê raporê de tê pêşkêşkirin.

Li vir min divê qala xebateke lêkolînerêkî tirk û navê Servet Mutlu bikim. Ev lêkolîn di kovara International Journal of Middle East Studies, hejmara 28 de derketiye. Navê nivîsê "Ethnic Kurds in Turkey a Demographic Study (Qewmê kurd li Tirkiyeyê, lêkolîneke Demografik)" ye.


Muthu di vê nivîsa xwe de dide zanîn ku li gorî texmînan nifûsa di navbera 3 milyonî û 15 milyonî de dike û tê. Di nava vê lêkolînê de hejmara kurdan a sala 1990'î wekî 7 milyon hatine pejîrandin ku ew jî dike % 12'yê nifûsa Tirkiyeyê ye. Rîjeya zêdebûna nifûsa kurdan di vê nivîsê de wekî %3.24 hatiye daxuyandin, her wiha rîjeya ji bo jî Tirkiyeyê %2.3 ye. Di tabloyekê de nifûsa kurdan a sala 1965'an û 1990'î bajar bi bajar hatiye dayîn. Xeletiya vê hejmara ji rîjeya kurdan a li hînek bajarêñ Kurdistanê jî diyar e. Bo nimûne li gorî tabloyê bi %43'yê Semsûrê kurd e.

Lê tê zanîn ku gelê Semsûrê bi piranî kurd e. Hînek tirkê li navçeyen Golbaşı û Besniyê û kesen ku ji derve hatine ne tê de. İcar çawa %67'ê Semsûrê dibe tirk. Her wiha li navce Semsûrê Kolika ku nifûsa wê li dora 50 hezarî ye, ji bilî kesen ku ji derve hatine tirk nîn in.

Mirov ji vê nivîsê hîn dibe ku di sala 1965'an de ji 5 paran pareke kurdan li derveyî Kurdistanê bûne, lê di sala 1990'î ji 3 paran parek derketiye derveyî welêt, dîsa jî piranî li welêt dijîn. (Tablo 2)

Wekî encam hejmara herî nêzî rastiye texmîna MGK'ê ye. Jixwe dagirker dema rastî ji wan re pêwist be, derewan nakin. Lewre dema ew derewan bikin, nikarin daxwazên xwe bi cih bînîn. Ji ber ku gel û rêxistinê gelêji dikarin ji raporê bi vî rengî sûdê wergirin, mora nihenîbûna li wan dixin û ji gel vedîşerîn.





- **23 Adar 1947:** Qazî Muhammed û hevalên wî li Iranê Maydana Çarçirayê, ji layê dewleta Iranê ve hatin daleqandin. Di sala 1946'an de Komara Kurdistanê ya Mehabadê bi serokatiya Qazî Muhammed ava bûbû.
- **25 Adar 1976:** Serokê Serhildana Agîr Ihsan Nûrî Paşa wefat kir.
- **28 Adar 1980:** Di Berxwedana Şikestûnê de Ahmet Kurt, Mehmet Kurt û Salman Doğru şehîd ketlin.
- **28 Adar 1986:** Serleşkerê HRK'ê (Hêzên Rizgarîya Kurdistanê) Mahsum Korkmaz (Egid), li Çiyayê Gebarê şehîd ket. Fermandarê HRK'ê yê yekemîn Mahsum Korkmaz bi hevalên xwe re li dijî leşkerên tîrkan kete şer û di vî şerf de şehîd ket.
- **29 Adar 1991:** Ji komutanen PKK'ê Haydar Altun (Kara Ömer), li Botanê dîl ket destê leşkeren tîr û ji layê wan ve hat qetîkîrin.
- **26 Adar 1994:** Berendamê DEP'ê yê Serokatiya Belediye Nizipê Mesmet Şen ji layê kontrayan ve hat qetîkîrin.
- **23 Adar 1960:** Bedüzeman Saîdê Kurdi wefat kir. Di salâ 1876'an li Hizana Bedîsê li gundê Norsê hate dinê. Di 84 saliya xwe de li bajare Rihayê çû ser rehmeta xwedê. Seîdê Kurdi Li pey xwe 130 Risaleyên Nûr û bi sedhezaran şagirt hişt. Cihê goristana wî nayê zanîn.
- **27 Adar:** Li dinê roja teatrê (şano) ye.

## AWIR

# Li NÇM'ê bîranîna



**"Ger hunermend dixwaze di nava dilê gel de nemir be, divê derd, kul, êş û azarên gel bînin zimên."** Xweyê van gotinan Mihemed Şêxo, ji layê hunermendê NÇM'ya Stenbolê ve, bi stranê wî yêne xweşik hat bibîranîn.

**D**i roja 15'ê adarê de li NÇM'ya Stenbolê di salvegera mirina stranbêjê kurd û bi nav û deng Mihemed Şêxo de programeke taybet hat amadekirin û di-vê programê de diwazdeh stranê wî hatin stirîn. Ji xeynî van stranan jî stranekê gelêri, stranekê hunermend Seîd Yûsîv û stranekê ku ji hêla Hisênkê Omerî ve hatiye berhev-kirin hate pêşkêşkirin.

Mihemed Şêxo hunermendekî pir bisans bû ku, Koroya NÇM'ê di programê xwe de yekemîn care ku Hunermendekî kurd ji xwe re mijar dinîqîne û pêşkêş dike. Ji ber ku koro nû hatiyê damezirandin. Koro her çiqas ji 25 keşan pêk tê jî, ji ber programê xwe hin endamên koroyê cih negirtibûn. Bi dengê hunermend Meral û Hesen bi stranekê gelêri ya "EZ keç im, keça kurda me" koroyê dest bi programa xwe kir.

Hate dîtin ku Kurdên bakur li ser vê xebatê gelek nû û bêtetrûbe né. Lî ev ji nişan dide ku gava ku li ser bê rawestin bêguman wê bi ser bikevin. Ji ber ku di demeke kurt de û tevî hin kêmasiyan jî mirov dikare bibêje ku koro serkeftî ye. Dîtina min rêzgirtina hunermendan li gorî estetika ditbarî hatibû nirxandin.

Di destpêka programê de xebatkarê

NÇM'yê Cemil Denli li ser jiyana M. Şêxo rawestiya û da xuyakirin ku M. Şêxo di bihara têmenê xwe de dev ji jiyana xwe ber dide. Lewre ew hê di sala 1948'an de li gundeki Qamîşlo, bi navê xwe yê resen Mihemed Salih Şêxmus hatiye dînyayê. Rewşa wî ya dibistanê ne ew qas berbiçav bû. M. Şêxo di sala 1972'yan de dibe endamê Hevgirtina Endamê Lubnanê.


Dû re dîsa vedigere welêt li bajarakê Rimelanê komeke musikê dadimezirîne. Bi vê xebatê dixwaze kambaxiya ku dagirkeran pêk anîne bêtësîr bikê. Ji bo vê yekê di eynî salê de diçe Başûrê Mezin. Gelek stranê wî di Radyoya Bexdayê tê weşandin. Piş re dîsa vedigere Başûra Biçûk. Di vê vegevînê de Polisê Sûri jê re dîbin asteng. Gelek caran tê girtin, gelek işkenciyê dibîne.

Di sala 1975'an de jî dikeve riya Rojhilata Kurdistanê û li vir bi cih dibe û dizewice; dibe xwedî zarok. Serê wî bi polisên Iranê re jî dikeve belayê û ew dizivire Qamîşlo. Di sala 1988'an de li Qamîloyê di ce ser dilovaniya xwe. Her wekî ew jî dibêje: "Ger hunermend dixwaze di nava dilê gel de nemir be, divê derd, kul, êş û azarên gel bînin zimên."

DÜZGÜN DENİZ

## ÇAVDÊRÎ

MİRHEM YİĞİT



### Pytagoras, Zerdeşt û Bûdha

**G**ava ku mirov qala dîroka fîkrê dike û gotin li ser herk û meylê fîkrî be, çend damar û şaxê merkezî tê holê. Ev jî dînî ne, siyasi û felsefi ne. Li gorî demê û zeman carinan ev damar û carinan şaxê din bandor bûye, mohra xwe li fîkrê xistiye û rengê xwe dayê ye.

Diya fîkrê kevn e, dirêj e, bi fitlonek û zîvronek e. Şopén li ser rî diyar in, kûr in, mezin û biçûk in û pir caran jî, ji xwîn û xwêdanê sor bûne.

Fikar bi giştî li dora sê mefhûmên mîna Xwedê, însan û xwezayê civiyane. Xwedê, însan û xweza; var her sê pîrsan însan zehf mijûl kirine, ponijandine û heta iro ji bûne handerên mîjîyê me.

Şarezayê dîroka şaristanî, fîkr û kulturê bi kîmanî behsa 8 kulturan dîkin: Kultura Misrê, kulturên Hindû Çinê, kultura yewnanî, kultura ereban, ya meksîkî û di dawiyê de kultura Faust li Prûsya. Li gorî Oswald Spengler her kulturê kêm zêde hezar salî emir kiriye. Heta dawîya pêncsed salî ges û gur bûye û jê û pê de serberjîr bûye, ketiye. Balkêş e ku kulturnas û şaristanînas Spengler jî mîna gelek hevpîşeyen xwe dema kulturan dihejmêre ji Mezopotamya û Rojhilata Navîn desî-pê dike û piştre yên mayî dike rîz.

Kîjan kultur berî yên din tê, kultur û şaristanî cara pêşî li ci hindamê ji diya xwe bûye. Ev pirsek e ku heta iro jî munaqeşe dibe. Lî tiştê zelal ev e ku şaristanî û çandeke ku serbixwe be, bi temamî ji yên din qut û cihê be, tenê mohra qewm û neteweyekê hilgire, dîrok nas nake. Her kultur bi vê nisbetê yan bi yeke din muheqeq çendrehî ye. Lewra di nav çand û şaristana vir û dera han de tim cûn û hatinek çêbûye û ev jî bûye sebeba tesîrên çendalî.

Dîroka dînyayê bi awayekî jî dîroka têkiliyên nav şaristaniyan û çandê cihê ye. Heyamekê asûrî li ser şaristaniya babilîyan rûniştin, şaristaniya Roma li ber destê ya yewnaniyan çavên xwe vekirine. Û yewnanî bi xwe jî ji kulturên Mezopotamya û Misrê re bifişik bû, ji wir heyvanên xwe girtine.

Ji bo vê gelek nimûne hene. Nimûneyeke xurt jiyana Pytagorasê yewnanî ye. Li gorî ku tê gotin zemanekî, Pytagoras çûye Misrê. Di wextê vê serdana wî de persiyan êrîşek anîne ser Misrê. Di vê êrîşê de Misr xesarek mezin dibîne û ji xelkê welêt gelek esîr dikevin desten persiyan. Di nav van esîr û rehîneyan de dibêjin Pytagoras jî hebûye. Bi vî awayî ev zana heta bi Îran û Kurdistanâ iro diçe. Lî tesedûfa hê mezintir ew e ku careke dî li gora riwayetan Pytagoras li wir Zerdeşt jî nas kiriye û di nav wan de dostanetiyeke germ çêbûye. Hin şîroveger û lêkolîn-erên Pytagoras jî dibêjin ku Pytagoras di bin tesîra Zerdeşt de maye. Hin li vir jî nasekinin; sefera Pytagoras heta bi Hindistanê dirêj dikin û dibêjin ku li wir jî wî û Budha hev du nas kiriye. Ji bo pişgirîya dîtinê xwe jî dibêjin ku Pytagorak di nav pir tiştan de cihguhertina kontroleke xurt li ser xwe, konsantrasyon û kûrfikirînê, her wiha hezkirina ji mirovan û bawerîanînek bi wan ji Bûdha û mesela tarî û ronahiyê, dijayedîya nav wan, xisleten li dijî hev wekî germ û sar, ter û hişk jî Zerdeşt û felsefeya wî girtine. Divê bê gotin ku li ser sefer û gera Pytagoras di desten dîroknas û fikirnasan de çu delîl û belgeyên saxlem tune ne. Belê tiştîkî diyar heye ku gelek xet û rengê van her sê mirovan li hev diçin û şik tê de tune ku haya Pytagoras jî Zerdeşt û Budha û jî dîtinê wan hebûye.

Dengbêj Salihê Qubînê:

# Dengbêjî kaniya dîroka kurdî ye

**Li Kurdistanê bandoreke dengbêj û çîrokbejan a taybet li ser gel heye. Heta tê gotin ku çand û zimanê kurdî bi saya wêjeya devkî li hemberî politikayên pişäftinê li ser piyan maye. Denjbêjên Kurdistanê carinan stranê evînê, carinan jî stranê şer û mîrxasiyê dibêjin.**


**Di wan stranan de hem dîrok hem jî edebiyata kurdî ya devkî heye. Berê li Kurdistanê karê dengbêjan bi tenê ger û stran gotin bû. Gelo îro rewşa dengbêjan ci ye? Dengbêj karê xwe çawa icra dikin. Li ser vê yekê hevalê me SALIHÊ KEVIRBIRÎ bi dengbêj Salihê Qubînê re hevpeyvînek pêk anî.**

**S**alihê Qubînê, yek ji dengbêjên me yê bi nav û deng ku bi taybetî li herêma Xerzan, bi giştî jî li tevahiya bakurê Kurdistanê tê nasîn. Salihê Qubînê; filehêن koxa, ezidiyêن Hemduna, Şerîn Mala Faro û Seyîdê Badayê, Batmana Şewitî û Bişeriya Kambax, Elyê Ünis, Keremê Qolaxasî, Şêxên Zoqeydê, Begênen Eyndarê û koçerên Kanîgewirê di kilam û gotinê xwe de dide jiyandin. Bi kurtahî ev ciwanmîrê hanê deng û awaza Deşta Xerzan bixwe ye. Dema kilamên “Lawko dîno”, “Haylo li min” (xêlya ya Farqînî) û “Hawer were” bê gotin Salihê Qubînê tê bîra mirov. Her wiha “Emê Gozê” kilameke ku ji hêla Seydayê Cegerxwîn ve jî gelekî hatiye ecibandin awazeke şérîn e ji devê Salihê Qubînê...

Beriya her tiştî em dixwazin we nas bikin. Kî ye Salihê Qubînê?

● Di sala 1949'an de li gundê Eynîdarê yê bi ser Misircâ Sîrtê ve, ez hatime dînyayê. Ji ber feqîrî û belengaziyê, hêj-di zarokatiya min de malbata me li gelek gundan geriyaye û bi cih bûye. Berê mala min li Batmanê ye. Kurê minê mezîn vê gavê li Hepsa Çankiriyê ji doza PKK'ê radizê û 18 sal ceza xwariye. Ji xeynî karê dengbêjiyê ez avahî û Mizgeftîn gundan digirim û çêdikim. Anglo ez “înşaatçı me jî”..

We çawa, ci çax û bi ci awayî dest bi dengbêjiyê kiriye? Ev çend sal in ku



hûn stranan dibêjin, di malbata we de ji xeynî we kesen ku distrêh hene?

● Hê di 12-13 saliya xwe de li poxan û bênderên Xerzan min kilam di-gotin. Min dêhn û bala xwe dida darekê, xaniyekî, mirovîkî an jî hêywanekî, min digot û li hev dianî. Di malbata me de birayê min ê mezîn ku “Qasimê dengbêj” jê re dibejin berê jî stran digotin û îro kêm be jî dibêje. Bavê min “Hemê” jî dengbêj bû, lê dema ez dibim 9-10 salî êdî ji bêtaqetiyê dev ji stran û kilaman berdide. Ev 40 sal e ku

cennet be.

Hûn di kilam û gotinê xwe de behsa ci dikin. Behsa evînê, behsa şerîn eşîran? Navbera we û kilamê serhildan çawa ye?

● Em di kilam û gotinê xwe de behsa şerîn eşîran dikin. Em kilamên evîndariyê ku ji wan re “kilamên dila” tê gotin dibêjin. Mesela li Kurdisatnê gelek eşîr hene malê hev birine, talana hev kirine, li ser miratê hev rûniştine, zilm û zorî kirine ji hev mirov kuştine,

**D**engbêjî “Tarîxa gelê kurd” bi xwe ye. Ji ber ku hînek bûyer hene beriya 200-300 an jî 400 salî çêbûne. Eger ku îro hêj jî ev bûyer û qewimîn winda nebûbin û têne gotin, ew yek bi saya dengbêjiyê ye.

ez dibêjim. Hînek kilam û awaz, min ji bavê xwe û birayê xwe Qasim girtine.

Gelo hûn di bin bandora kîjan denjbêjî de mane, ango hûn riya kîjan dengbêjan ji xwe re esas dibînin?

● Dengbêjî ku ez di rîça wan de çûme û diçim Teyîbo ye. Teyîbê Dengbêj ji Sîrtâ ya Misircê ye. Wekî din Hiseynê Hingîlosî yê Muşî, Zahîro û Şakirojî gelek tesîra xwe li min kirine. Her wiha mamê min Niyazî jî dengbêjekî baş bû û dengekî zîz û zelal li ser hebû. Ez îro ji te hîn bûm ku Şakirojê dengbêj çûye ser dilovaniya xwe. Ez gelekî pê eşiyam. Rehma xwedê lê be, cihê wî

axa hene, şêx û beg hene, axlebî (bi piranî) em li ser jiyana wan ên ku carinan paqîj û carinan jî genî ye dibêjin.

Te navbera me û kilamên serhildan pîrsî ku em ji wan re “kilamên mîllî” dibêjin. Em kilamên mîllî dibêjin. Di van kilaman de em behsa kesen ku di welatê xwe de li hemberî dijmin serê xwe hildane wekî Şêx Seîd, Seyîd Riza, Kor Hiseyn Paşa, Xalid Begê Cibrî, Fersende, Mala Seyîdxan û Mala Eliyê Ünis tînîn ziman. Zordariyeke giran, mîrkûjiyeke dijwar û evîneke paqîj li ku be, em jî li wê derê ne..

Bi giştî hûn li “Herêma Xerzan” tê-

ne naskirin. Gelo kesekî serhedi, toranî an jî botanî li Salihê Qubînê guhdarî dike an na? We bi kîjan kilaman nav daye?

● Belê! Belê! Kilamên min û banden min cihê ku navê Kurdistanê lê hebe têne guhdarîkirin. Li hêla din li Tirkiyeyê û li derveyî welêt jî xelq hatine banden min tije kirine û bi xwe re bîrine. Di sala 1978'an de nizanim kîjan bajar bû du kaset ji min xwestin, min ti-jî kir û şand. Ji Fransayê jî hînek saziyên kurdan ku vê gavê jî ji bo welat di-xebitin, hatin ez dîtim, navê yekî ji wan Şexmûs bû, du-sê banden min jî bi wan re hebûn. Ji min re wiha gotin: “Seydayê Cegerxwîn ji van tevahiya kaseten dengbêjan, kasete te ecibandîye, kilama “Emê gozê” zehf li xweşa wî çûye. Emê carekê din werin û emê te biavêjin kamerayê” lê carekê din me hev nedît.

Di nav kilamên min de ku yên xelkî guhdarî dik û di nav xelkê de têne ecibandin “Kilama Hesoyê Brahîm û Serê Hethetkê” ye.

Hetanî vê gavê we çend kasete tijî kiriye, dema hûn dest bi gotina stranê bikin; hûn dikarin çiqas bistrêng ango

*hûn çend stran dizanin?*

● Hejmara kaseten ku min tijî kiri-  
ne ez baş nizanim, lê gelek in. Gava ez  
dest bi gotinên stranên şer, evînî, mîlî,  
eşîrî dikim dizanim ku gotina her yekî  
bi saetan e. Vê gavê ez dixwazim navê  
çend stranen ji te re bibêjim qet nayê  
bîra min, lê dema min dest pê kir, çawa  
ku baran tê, ev stran jî dikevin rîzê, tê-  
ne hûş min û ez dibêjim..

*Di çand û folklor gelê me de rola  
dengbêjiyê ci ye?*

● Rola Dengbêjiyê ew qas mezin e  
ku nayê gotin. Xwedî roleke girîng e.  
Dengbêji "Tarîxa gelê kurd" bi xwe ye.  
Ji ber ku hinek bûyer hene beriya 200-  
300 an jî 400 salî çêbûne. Eger ku ûro  
hêj jî ev bûyer û qewimîn winda  
nebûbin-û têne gotin, ew yek bi saya  
dengbêjiyê ye. Ji ber ku wan çax û de-  
man di nav gelê me de nivîsin û pirtûk  
tunebûn. Dengbêji ji me re bûye mîna  
'Belge û rastiyen dîrokê' em jî dewri  
hev dikin.

*Dîtina gel li ser dengbêji û dengbê-  
jan çawa ye. Gel bi ci awayî li we dinê-  
re?*

● Xelq ji me zehf hez dike. Wexta  
ku xelq me dibîne bi xêra stranen me  
hurmet nîşanî me dide. Em li ku derê  
bin civata me xweş e, qelebalix zêde  
ye. Hê ez xort bûm, simbêlén min der-  
neketibûn, ez dibirim dawetan. Dawetek  
li ku derê hebûya em li wê derê  
bûn. Ji bîra min naçe; carekê ez çûme

● Belê rast e! Dengbêjiya  
20 sal berê û iro ne wekî hev  
e. Berê xelkê bêhtir guhdarî  
dikir. Berê li civatê me ji za-  
rokên 7 salî, hetanî kalên 70  
salî rûdiniştin. Hetanî berê si-  
bê bêxew me digot, wan jî lê  
guhdarî dikir. Wey li wî ku  
em bibin mîvanen xelkê. Vê-  
ga ne wekî berê ye.

*iro her ku diçe teknoloji bi  
pêş ve diçe. Radyo û televîzyon  
ketine her malê, her kesê  
ku bixwaze, dikare her gav ka-  
seta ku dixwaze lê guhdariyê  
bike li ber xwe bibîne. Gelo  
tiştîn bi vî awayî tesîra deng-  
bêjiyê kêm dikin?*

● Belê çawa ku me di bers-  
biva pîrsa berê de jî got, heger  
tesîra dengbêjiyê iro kêm bûbe ji vê se-  
demê ye. Tu ûro kaseta kê bixwazî li  
ber xwe dibîni, çiqas canê te bixwaze,  
tê lê guhdar bikî. Iro her dengbêj û  
stranbêj, her kilam û kaset ketine mala  
xelkê. Lî, berê teyb, tv û radyo tunebûn  
her tişt em bûn.

*Hûn stranbêjên vê demê ku bi awa-  
yekî nû û hemdem distrîn, çawa dibî-  
nin?*

● Em stranbêjên vê demê ku li ser-  
derd û kesera welatê xwe dibêjin pir  
baş dibîni. Hurmeta me ji wan re he-  
ye, ez çavêwan diramûsim. Zehf bas  
e ku mirov li ser welat, li ser zilm û iş-



bînin?

● Em dibêjin "hûn ne baş dibêjin."  
iro her çiqas stranen şoreşê lazim bin,  
gotin û kilamên dengbêjan jî lazim in.  
Hurmeta me ji stranen wan re heye, lê  
divê hurmet ji dengbêjiyê re jî hebe. Ji  
ber ku dengbêj bûyeren wisa dibêjin ku  
mirov ji wan fîye û dersan digire.

Ew kesê ku şoreşâ iro ne baş dibîne;  
dîn û îmana wî piçek jî nîn e. Ji ber ku  
şoreşâ iro di navbera zâlim û mazlûman  
de derbas dibe. Gelê me gelek roj-  
jîn zor derbas dikin, gund û bajarân  
wan hê jî têne talankirin û miratekirin,  
bi hezaran zarokên me canê xwe dane û  
hê jî didin. Heps û zîndan bi însanen

me tijî bûne. Lî bi alîkariya xwedê û  
pêxemberan û bi saya zarokên me wê  
ev zilm biqedede. Emê jî rojîn azad bibî-  
nin û dîsa wekî berê emê werin cem  
hev stranen xwe bibêjin.

*Mîna gotina dawî; hûn bi çavêkî ca-  
wa li MED-TV'ye dînihérin?*

● Ez nikarim bersiva vê pîrsê bi-  
dim. Ji ber ku ez nikarim qedr û qîme-  
ta TV ya MED'ê bînim zîmîn. Denbêj  
Gêncô êzidî ye, ji gundê Texêya Qubî-  
nê ye, hevalê min bû, derket  
MED-TV'ye. Kurê mamê min Şefik  
Yorulmaz (Nuzan-Hozan) carinan der-  
dikeve. Eger NÇM û MED-TV fersend



**Edî fersend û mecal hene ku zarok û  
nevîyen me dengbêjiya me û folklor me ji  
pirtûk, sazî û rojnameyên me hîn bibin.  
Di vir de rola NÇM'ê derdikeve holê.  
Divê NÇM kilam û gotinên dengbêjan  
tomar bike û binivîse. Ji ber ku her diçe  
em kêm dibin.**



**Ew kesê ku şoreşâ iro ne baş dibîne; dîn û  
îmana wî piçek jî nîn e. Şoreşâ iro di  
navbera zâlim û mazlûman de ye. Gelê me  
gelek rojîn zor derbas dikin. Lî bi alîkari-  
ya Xwedê û bi saya zarokên me wê ev zilm  
biqedede. Emê dîsa wekî berê werin cem hev,  
stranen xwe bibêjin.**

dawetekê li gundekî lê ez li 25 gündan  
geriyam, 25 dawet kîrin lê hê ez hatime  
mala xwe. Nedihiştin ku ez herim malê  
ew çend ku hezkirin hebû. Carna jî di  
dawetan de li def û zirnê dixistin. De-  
ma ez û hevalên xwe diçûn digotin  
"Def û zirnê bisekinin" Def û zirne  
disekinî, min dîlokên dawletan digotin,  
hevalên min jî li min vedigerandin,  
xelkê jî daweta xwe dikir.

kenceyê bibêje.

*Hûn di kilam û gotinên xwe de ji Hz.  
Ömer hetanî Şêx Seîd, ji Bişarê Çeto  
hetanî Eminê Perîxanê, carinan jî ji  
Kemal bigire heta Ebdilhemîd tînin zi-  
man. Gelo we ew agahî çawa bi dest  
xistine?*

● Em çawa hîn bûne. Ez ji bavê  
xwe hîn bûme, ji dengbêjan hîn bûme,  
yekî din rabûye ji bapîrê xwe hîn bûye.  
Gelo tu dikarı dengbêjekî nîşanî min  
bidî ku ji pirtûk û mekteban stran hîn  
bûye? Na nikarî!.. Em wiha hîn bûn, lê  
edî fersend û mecal hene ku zarok û ne-  
viyên me dengbêjiya me û folklor me  
ji pirtûk, sazî û rojnameyên me hîn bi-  
bin. Di vir de rola NÇM'ê derdikeve  
holê. Divê NÇM (ez jî di nav de) kilam  
û gotinên dengbêjan tomar bike û binivîse.  
Ji ber ku her diçe em kêm dibin.

*Hinek kes dibêjin "Edî stranen şore-  
şê hene, dev ji kilam û şerîn dengbê-  
jan berdin". Hûn der heqê wan kesan  
de ci dibêjin û hûn şoreşâ iro çawa di-*

### Du kilamên Salihê Qubînê

**Lê mehteberê, nebînim nemaye.**  
*Bila Xwedê bikeve soz û qerar û bextê  
Şahê İranê*

*Ka ez ji we re bêjim stranen axe, axel-  
er û şêxler û mirakên Kurdistanê,*

*Ka Bişarê Çeto, Cemîle Çeto, Eminê  
Ehmed, Evdilê Perîxanê,*

*Ka Elyîê Ünis, Evdalê Mistê, Keremê  
Qalxasî, Silêmanê Ehmed, Bavê Kazim,*

*Fermendê Bavê Efezya, ecema  
dikuştin bi al û albayê İranî,*

*Kanê Sevdînê Lawê Fethela, li  
kaşxane Erdîşa Şewîfi ku jehrî danê,*

*Kanê Cewher Begê di hewşa kafîre  
Emek-Turban de gulê tek-ayax bi dest  
berdanê.*

*Lê mehteberê, nebînim nemayê..*

*Bila Xwedê bikeve soz û qerar û  
bextê Şahê İranê*

*Kanê Xalîd Begê Cibrî, Kor Huseyn  
Paşa yê millî, û Mîlûkîn Kurdistanê,*

*Kanê Şêx Seîd, Xudbê Kamil,  
Murşîdê reknê dinê İslâmî,*

*Kanê Şêx Şabedîn, Mehmed Şérîn,  
Seyîd Elî Şêxen terîqetê*

*Ku di hizûra xwedê û pêxember de*

*xelas kirin îmanê.*

*Herçî yê ku mîrê misilman be, dîn û  
îman ji bonî wî hebe,*

*Ew tu cara vî dengê hanê ji bîra neke,  
heya axirê zemane...*

### Gorî gorî

*Mala min bi xulama bejna berî, zendê  
bازن lingê morî*

*Gorî gorî xerab ez im, gorî heyr mala  
delalika dilê min li taxa jorî,*

*Mala min bi xulama bejna berî, zendê  
bازن lingê morî.. Gorî gorî xerab ez im.*

*Gorî hate binê konê mala bavê min e  
bi qestanê jîna*

*Min rabû qestanekî ji delalika xwe re  
kirî, bi sî û sê bizina*

*Qestan ji zenda re kin e, nagire zer  
bazina.. gorî gorî ez goriya te me.*

*Gorî konê reş e, li pêş gir e, batê ji  
baranê gurtir e.*

*Kon û çitên mala bavê min giran in,  
serîtê kona ranegire,*

*Herçî ji nav her du dilan xeber bide,  
belki ezizê li ber dilê wan bimire*

*Gorî gorî xerab ez im..*

*Nexwe hûn dibêjin dengbêjiya 20 sal  
berê û iro ne mîna hev e. Hûn dikarin  
qiyas û şîroveya vê yekê bikin?*

# Newrozname

Ü hûn...!

**Ey Qeladiza bedbext û perîşan, Zêwe û Balîsan, ey Halebçe, Gelyê Bazê Dêryasîn...**  
**Hûn; ey şermezariyên sermedî ên li eniya mirovayetiyye.. Hûn; ey bi hezaran qurbaniyên ku bûne kevokên aştiyê; mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...**

*Hey gidi adar û adar  
Te çi dît û te çi nedît  
Ne tê gotin  
Ne tê jimar...*

**E**y şûnwarê destpêka mirovayetiyyê, ey zozan û germiyanen koçer û revendiyên ku li hemû demêm mêtjûyê bûne cihê serbilindiya botiyan; ey Bedirxanê Botî, Miqdad, Celadet, Kamîran, ey Cûdî Gabar, Cîro, Herekol, Fereşîn... Ey Birca Belek, ey evîngeha Mem û Zînê, mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...

Ey wargehê xweşimirov û mirekan, Tengey Zendwêran, Babana rengîn, Bêxal, Sîrwan... Ey gulçîcka Qendîl û Pîremegûn, ey Silêmanî, ey şarê Helmet û qurbanî, ey Babagurgur kangeha jan û jîn, mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...

Piştî rabûrîna çend sedsalêñ kind û kirêt di jiyanâ dêrîni kurdewarî de, piştî serfîldana neherêkirina jiyanâ serşorî û bêrûmetiyê li hemberî dagîkerên barbar û nokerên emperyalîzmê, ey ewên ku bi armanc û daxwaza jiyanekê azad û mirovane derketin gorepana rûmetê, Xalid Begê Cibrî, Şêx Seîdê Kal û bi hezaran xebatkarên serbilind, ey Palo û Piran, Dêrahînê, ey Nemrûdê delodîn, mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...

Ey ewên ku ji kerba dîrokê bi xwîna xwe serbilindî û dêrîniya Agîrî û Zagrosan li ser rûpelêñ mêtjûya dêrîni nete-

weya kurd a nemir nivîsandin, ey ewên ku di asoya elenda Zagrosan de pirîskêñ têkoşîna kurdøyetiyyê ya bêdawî hil-kişîn û teyisandin, ey Brehîmê Heskê Têlî, İhsan Nûrî û bi hezaran lehengê navnediyar, ey Agîrî, Tendürek, Torîsan, newal û gelîyen jar û xemgîn, mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e, Newroz û bihar e...

Dêrsim, Qoçgîrî, Sason, Gelyê Zilan, digel bi sedan newal û şikeftên ku bi hezaran dildar û evîndar, dotnam û pismamîn nazdar di hembêzîn xwe de bêdeng veşartine, ey rûmetên berxwedana zarokên agir û rojê, Elîşan, Elîşêr, Seyid Rizoyê dilovan, dayika mîrxasan Besê, Eliyê Ûnis, ey wargehên şer û plingîn aza û serfirazîn pir jan û jîn, mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...

Tenanet bi armanca domandina temenekî şad û bextewer, ji bo dawilêhatina jiyanâ kind û serşorî ya bêserüber, ey ewên ku bi payebilindiyekê ku nayê pesindan berê xwe dane sêdâren esrarkêşen eceman, ey Qadî Mihemed, Seyf Qadî û hevalîn xwe, Qasimlo, Şeref-kendî, ey gorepana Çarçirayênu ku bêwext vemirîn.. Kaniya xwîna şêhîdan, ey wargehên huner û ronakbîran, Sine, Bane, Merîvan Şîno û Mihabata jar û bi kîn, mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...

Ji bo berdewambûna payebilindîya kurdewarî, ji bo mirandin û serkutkîrîna jiyanâ kolewarî, ey ewên ku bênavê-

bir ji Yezdanê rûmet û azadiyê re pîrozîtin can kirin xelat û diyarî, ey ewên ku peyapey ji bo parastina şan û kesatiya kurdøyetiyyê sînor dirandin, ey ewên ku piştî rîpîvana gelek şev û rojan rûbarê Aras şeqandin, ordî şikandin... Ey Şêxê Zirav ey Berdî Qahreman, ey Serdar û Serwanê karwanê lehengê Haciûmran û Gilala, ey ewên ku bi salan, bi şev û rojan rextê çarperce li bejn û bala, ey Barzan, her du Zê, ey Rûşîn... Ey Lales, Gare, Zozik, Metîn, Hindirîn û Şêrîn, mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...

Ü hûn...!

Ey Qeladiza bedbext û perîşan, Zêwe û Balîsan, ey Halebçe, Gelyê Bazê Dêryasîn... Hûn; ey şermezariyên sermedî ên li eniya mirovayetiyye.. Hûn; ey bi hezaran qurbaniyên ku bûne kevokên aştiyê; mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...

Ü hûn...!

Ey serwan û rîberêñ karwanê jîn û evînê, ey şagirtiyêñ Zeradeşte Kal, Xeyrî, Ferhad, Elî, Egîd û bi hezaran Mazlûmîn sedsalan... Mamostayêñ sevgîrêñ şevezengî welatê rojê, ciwanâtirîn nimûneyêñ dildarî û evîndariyê, xwezi we iro pirêzeya xwe dîtibûna! Ew rîbaza berxwedanê ya ku we bi xwîna xwe danî, bi destê vemayêñ we li seranserî welatê rojê bûye rewneqa rûmetê, bûye tîrsa dawî ya nemana dijminan... û hûn; ey canfidayêñ di çal û zîndanêñ hov û dirindeyan de, ey ewên ku

soz û peymana Mazlûm, Xeyrî û Ferhadan bi serbilindî bi cih anîn û tînin, mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...

Ü hûn...!

Ey kewribatê zozanan, ey Mêke-wêñ li ser hêlin... Ey ewên ku di destpêka temenê xwe yê ter û germ de rabûriya dûr û dirêj a têr ês û jan, ya pir xwîniyâ kurdøyî û welatê rojê di nav dil û cergêñ xwe de çandine, ey zêrevanêñ deşt û çiyayêñ welatê Rojê; ey ewên ku her sibe li gopîtka çiyayêñ xwe bixêr-hatina rojhîlat dikin... Hûn her li bîr in Kesera we her di dil de û çav her li riya we ye û li roja gihiştina me bo we û li roja serkeftina we ya yekcari ye...

Ü hûn...!

Leyla Qasim, Margaret Şelo, Zekiye, Gulnaz, Rahşan, Bêrîvan û Ronahî...

Mizgîn e iro li we mizgîn, sersal û adar e Newroz û bihar e...

Ü tu...!

Xemla siruştê, rewşena şax û daran. Navenda bihiştê, yarîgeha berx û karan. Wekheviya bêkemâsi, yeksaneyâ şev û rojan. Serkeftina Hurmuz, binkeftina Ehrîman. Tozgevîza jînê, evîngeha Mem û Zînê, seyrangeha caran. Cejna kurdê payebilind, xoştiviya bav û kalan...

Bi hemû xweşî û nexweşiyêñ xwe ve, bi hemû şadî û xemgîniyêñ xwe ve, bixêr hatî Newroz!

DILDAR ŞEKO





Li navendê çandê çatakiyêni vê hefteyê  
Le NÇM'ya Stenbolê

- 23.03.97 Yekşem filmê belgeyi 'Faşizma ji rîzê', saet: 14.30
- 26.03.97 Çarşem: Semînera Cevat Çapan 'Di teatraya İrlandayê de rastî', saet: 18.00
- 28.03.97 În: Koroya NÇM'ê 'Marşen me yên azadiye', saet: 16.00
- 29.03.97 Şemî: Konsera Koma Çiya, saet: 14.30
- Teatra Jiyana Nû, Bayê Elegezê, saet: 17.30
- Li NÇM'ya Izmirê
- 23.03.97 Yekşem: Ji Beşa Şanoyê ya Dengê Bahoz "Hêviya me hûn in", saet: 16.00
- Konsera Koma Şengal, saet: 18.00

- 28.03.97 În: Konsera Koma Rewşen ji NÇM'ya Edeneyê, saet: 18.00
- 29.03.97 Şemî: Roja xwarinê kurdan a gelêri, Koma Rewşen, saet: 16.00
- Li BEKSAV'ê
- 29.03.97 Şemî: Konferans: "Kurd û dema ronakbûnê", Ismail Göldaş, saet: 15.00
- Li Evrensel Kültür Merkezi
- 27.03.97 Pencsem: Pirozbahîya Roja Şanoyê ya Cihanê, saet: 19.00
- 28.03.97 În: Forum: Lijneya Nûnerên Xwendekaran, saet: 16.00
- Forum: Qanûna YÖK'ê, saet: 18.00

## AWIR


*Dr. Naci Kutlay:*

# 'Bingeħha nasnameya kurdî wêjeya devkî ye'

**B**i vebûna fuara pirtûkan re ji ali-yê weşanxanayan ve çalakiyên wekî panel, semîner û sohbetan tê lidarxistin. Ji van çalakiyan yeke herî girîng dî 12 adarê de bi rêvrebiriya Weşanxana Belgeyê pêk hat. Xwediye Weşanxana Belgeyê Birêz Ragip Zarakolu panel bi xwe bi rî ve bir. Navê panelê "Nasname û Çanda Jiyana Hevpar" bû û şes kes di panelê de axivîn. Beşdarvanên panelê Dr. Naci Kutlay, Nivîskar Ertuğrul Aladağ, nivîskar Asım Asan ji Yewnanistanê Yorgo Ardreadis û parêzvanê mafêni mirovan Yelda Xanim.

Ji ahaftgerên Panelê Dr. Naci Kutlay girîngiye nasnameyê û jiyanekî bi hev re anî ziman. Li gorî birêz Kutlay, ji bo jiyanekî hevpar nasnameyekî neteweyî pêwist e û divêt berê ev rastî bê nasîn. Ev jî bi çand û yekîtiya ziman watedar dibe.

Dr. Kutlay, pirtûka wî yâ nû weşîya bû, bi navê 'Pêvajoya Pêkhatina Nasnameya Kurd' bi mêvanan da nasîn. Dr. Kutlay diyar kîr ku, di vê xebatê de, li ser 200 salêni dîroka kurd û Kurdistanê yên dawîn rawestiye. Birêz Kutlay, "Bingeħha nasnameya kurdî wêjeya wan a devkî ye. Ev wêje bi awayekî kevneşopî ji nifşan derbasi



nifşen nû bûye. Wêjeya kurd di pêvajo-ya derbasbûnê de hîn dewlementir bûye. Li nik min zimanê biyaniyan berê erebî niha jî tirkî ji nasnameya kurdî re bûye astengeke dîrokî. Berê ronakbîrên kurd berhemên xwe bi zimanê erebî dinivîsandin. Yekemîn car hostayê mezin Ehmedê Xanî vê rîka ne durist avarê bû û Mem û Zîn bi kurdi nivîsand. Niha jî tirkî jî ber pêkhatina nasnameya kurdî bûye asteng. Hingî em hemû bi tirkî dixwînin û dinivîsinin, me ramîna bi kurdi ji bîr kiriye."

FEREĆ COBANOĞLU

## Pirozbahî



**E**m dizanin, rîka ku Mazlûman vekiriye li zindanan, ala ku Egitan rakiriya li çiyan, agirê ku Zekiyeyan bilind kiriye li ser birc û kelehan, alavênu ku Zîlanan bilind kiriye wek volkanan, iro fîkî û ramanen Ehmedê Xanî û Feqiyê Teyran, helbesten Seydayê Cegerxwîn û Osman Sebrî, stranen Mihemed Şêxo, dîwana Melayê

Cizîri û Pertew Begê Hekkarî, ferhenga Hejar tîne zimên. Bi vê fîkî û ramanen, ji çakûcê Kawayê Hesinkar, ji Mem û Zîna Ehmedê Xanî, ji sê meşaleyên Mezlûm, ji birc û kelehen ku Zekiyeyê pêxistiye, Rahsan, Ronahî û Bêrivanê geş kiriye heta iro, heta sibe, heta roja azadi û serxwebûna vî welati û heta ku navê kurd û Kurdistanê li vê cihanê hebe, em Newroza we pîroz dikin.

**Hemû hunermerd û xebatkarê**  
**Navenda Çanda Mezopotamya**

## TÎŞK

LERZAN JANDIL



Halepçe

**D**îroka şaran de gelê jenosidî viraziyê. Nînan ra tenê amê zanayene, tenê jî qe niyamê zanayene. Kolederî şîkiyê ke qirkerdenan xo bincil bikerê. Şarê ke amê qirkerdene kîsê ma û piyê xo ra şiyê. Ne nê şarî bi xo, ne jî kesê bînî şîkiyê ke ere nê şarî wayir biveciyê. Qe kes hemver/duştê nê qirkerdenan nêveciyo.

Nê qirkerdenan ra yew jî qirkerdena Halepçe wa. Halepçe dîroka mordematiyê de şermêde zaf bêhemd giran o. Rojanê 16–18 adare 1988 de firokanê leşkeriya Seddamî gazo jar est re şarî ma, şarî Halepçe ser. Nêzdiyê panc hazarî kes merd û des hazarî bî birîndar (dirbetinî). Qurbanê nê êrîşî şarî ma wo sivîl bî. Zafériya merdan doman, cêni û camerdê kalî bî. Ba do jî, se ke êno zanayene, şarî ma bî koçber. Zav-zér, cêni-camerdê çol û çolistanan ra şîliye û vare verde vêşan, teşan mendî. Xêlê kesê ma jî ma bêkesiyê de şî.

Bêguman mordem şikîno nê trajediye şarî ma yê o demî ser ro zaf çiyan binivisno. Û ez bawer kena, ganî bêro nivsnayene, ke her kes, her sistem, her bawariya guna xo, aybê xo, sewabê xo û başıya xo bizano, biyaro xo vîrî. Ebi na qeydeyî, demê ameyî de jî mordem şikîno bimusû ke Halepçe de şarî ma se amo qirkerdene û dinya verî nê jenosidî de se bêvend menda.

Na bêvengiyê, demo ke İraqî êrîş berd re Kuveytî ser, wertê ra deriye we. Çinay re? Ganî na rind zelal bêro eşkerakerdene. Sebebê naye angorê bawariya min, zerê yew nivisî de ebi kilmiye na wa.

Yew: Serokêde şarî ma, owo ke şikîno yewtiya şarî ma bivirazo û ê organîze bikero, çinêbî. Girêdayiyê naye

Dide: Şarî ma lete bi lete bî. Her partî û serok ne angorê interesanê şarî, la belê angorê interesanê aşîra xo û interesanê koledaran hereket kerd.

Hirê: Serokê şarî ma, yê nê leteyî, ne manaya kapitalizm de, ne jî manaya demokrasiye burjuva de serokê modern nêbî. Moderniye ra zêderî dewij, yan jî aşîr bî.

Çar: Dirakulayê hurdmîn sistemân Saddam sebebêde gîr bî. Yanê Dirakulawo ke sistemê reel sosyalizm û kapitalizmî viraşت.

Panc: Jiyayen, azâdbiyan û wayirê dewlete biyena kurdan de menfeatê hurdmîn-sistemân, yanê kapitalîstan û reel sosyalîstan çîne bî.

Şeş: Sebeta ke welatê ma bindestê çar dewletan no, imkana hetkariya şaranê bînan gelê kêm biye.

Na hal ewro jî dewam keno. Ge ênê werê, ge danê pêro. Yanê koledarî se biwezê serok û partî jî hêni kenê. Ge qeraranê zaf rîndan cêni, hemverê koledaran vecîne, ge jî raya xirabe nusnenê koledaran. Letebiyena şarî ma dewam kena.

Çare: Yewbiyena şarî ma, partî yan jî organizasyonêde şarî, serokêde modern. Nê çiyê ma estê yan jî çinê? Ez vana estê. Ebi dewijanê xo, ebi cêni û camerdanê xo, ebi roşnabîranê xo; dem, demê insîyalîfê şarî ma wo.

Dîroka şarî ma de, aşma adare de, kaleka na rûpala tarî û siyâye de çiyê rînd jî estê. Çimke her roj a na aşme wayirê manayêde hewl a. Nînan ra zê Hawtemal, Qere çarşemê martî, Newê Martî, Desûhwatî Martî, Newroze, destcikerdenâ wusarî, sarewedardayena Mazlûmî, Kawayê Hemdemî û êb. Ma ganî seba zê rojanê corênan, rojanê ke ma tede roşanan, şâhiyan û sarewederdayenê pîroz kenîme, bixebeitime.

# Girnewas

**B**êhiya limêja esrê kir. Bi awa yekî wekî gêjan cila limêjê dahev û danî ser teşta ku hevîre meyandî tê de ye. Lêva wê dilebitî, silawat dixwendin. Dengê xwe gihande mêmê xwe ku li hewşê mêmâ av dida.

-Heyra bi Xwedê ya herî baş ew e ku em vî lawîki bibine Girnewas. Hebe tunebe cinan lê xistiye. Dema ku hêj li ber hembêza min bû, xweş tê bîra min, te pelên pîvazê avêtibûn sobê. Bi Xwedê wê şevê bi Zeynî re giha. Erê karê Xwedê ye, lê ma kes ji ber xwe dîn di-be?! Tu bi ya min dikî vê çarşemiyê em şikevayekî li tenûre bixin, ereba hespan ya Remoyê Bahwarî bi heq bigirin û herine Girnewas. Em xwe bavêjine bextê Mîrê Cinan. Êvarê emê li wir bimînin. Belkî hêviya me ji Xwedê, dermanek ji me re peyda bibe. Hemû din-ya qesta Girê Cinan dike.

Mêrikê cirnexwes û bêhnteng bi kufuk li hermetâ xwe nihêri. Hermetê tê anî der ku gotinê wê li hesabê wî ne-hatin. Her çiqas pir cara lêdan ji destê wî xwaribe jî, nêta wê tunebû ku gotinê xwe vebire. Mêrikê bêhnteng gelek caran ku Zeynî zerar dida mîwan, lêdixist, lawik dikire rewşa mirinê. Dawî desten wî li qeydê dixistin û bi zincîre-ke zingargirtî ew bi dara tuyê ve girê dida. Berf û baran jî hebuya, Zeynî bi saetan wilo dima.

Guh neda Behiya, avdana xwe domand. Lê hermetê venebirî. Pitepita xwe zêdetir kir. Hemedo bi ser de hil bû:

-Keçê de bes gûyê diya xwe bixwe. Ka kîjan nexwes li Girnewas sipûsax bûye. Jixwe gir û mir jî li holê nemaye. Ev bû salek ku hikûmet dikole. Her ku dikole kûpêñ zér jê dertê. Heger cinê te ew qasî jêhatî ne bila rojekê desten wan ên ku kolanê dikan, hişk bike. Bila bi wan vede.

Cixareyek stûr pêça û bi hesteyê muxtaran vêxist. Jinê ji ber neda paş. Hate nêzî mîrik û lê vegerand:

-Kuro hiş be. Wele tu dê belenan bî-nî serê me. Tu çawa dev diavêjî Girnewas. Mîrê Cinan li wir raketîye. Kî ji bavê xwe ye, wê tiştekî ji hesin bi xwe venike û here bi tenê yek şevê li wir rakeve.

Zeynî, zarokêni li kolanê dabûne pey xwe û dibezî. Desten xwe mîna ku di-reksiyon girtibe dihejand. Bi devê xwe jî, teqlida dengê motora otobusê dikir. Carinan jî li qornê dixist. Dît, dîtttt...

Bav ew dît, hêj bêhtir bi ser Behiya de hil bû:

-Ma ne ew jî lawê te ye. Tovê xera-bûye.

Behiya bi van gotinan pir tenegezár dibû, lê nedixwest pir bi ser de here. Wê wekî her wextê lêdan bûbûna para wê. Dîsa jî di ber re avêt:


-Tu jî wekî teleba bêbawer î. Hemû dinya dizane ku Girnewas girê cinan e.

Her roja çarşemê cin li derdora Mîr dicivin. Yek bi yek gîlî û gazinê xwe, kul û derdên xwe ji Mîr re pêşkêş dikan. Yekî ku neheqiyejk ji destê mirovan dîtibe, yekî ku dijmin û xêrmexwazekî ci-nan tesbit kiribe, ji Mîr re dibêje. Di ci-vînê de li gorî súcê mirovan ceza tê bi-rîn. Dawa ji hemû cin li dora Mîr go-vendê dîtttt. Wekî pelên hişk, ên ku ba li wan bide, direqisin. Kesê ku care-kê govenda cinan bi çavên xwe bibîne, temenê wî dirêj dibe. Ci xwesteka ku

bazinê xwe bifiroşe, bila birayê te Elo vê sêsemê bibe. Ez bi xwe nayêm. Jix-we di hesteyê de rojekê betal im. Wê rojê jî bi kevrosk û kevokê xwe dadi-kevîm. Agir bi malê neketê bes min hêrs bike...

Hêj dê û bav di qirika hev de bûn, Serê Zeynî di deriyê hewşê re da der. Dawa kirasê xwe yê gulguş tijî beq ki-ribû. Hemû beq fetisibûn. Zeynî bi zi-manê xwe yê lalik:

-Bavo bavo, beq hemû bûne peqpe-



di dilê wî de hebe bi cih tê. Xwezî bi dilê wî kesê ku li ber agirê cinan rûnê. Mêriko! Tu bi Xwedê kî, yek carê min neşikîne. Em herin mîhekê, heger nebe bizinekê bikirin û li wir ser jê bikin. Tişteku me jê xwar, tişteku "jimeçeti-ran" ji xwe re bir. Yê ku ma jî, emê bi-dine parsek û belengazan.

Hemedo xortimê xwe da hev. Giyayê ku çinibû avête kozika keroşkan ya ku li kuncika hewşê bû. Bi awayekî heçkû di ber dilê hermetâ xwe re here û were got:

-Hermet, tu dibînî ku ji serê sibê he-ta eşayê ez pîfîketan vedibirim. Roja-neya min çiqas e... Em zikê xwe têrnân nakan, tu qala cinan dikî. Şikir ji Xwedê re, halê cinan xweş e. Ma rewşa wan ji ya me ne çêtir e? Tu ew qasî dixwazî

qok. Peqpeqok teqî. Teq...

Bav awireke dijwar jê veda. Behiya pir tîrsiya ku dîsa bav wê lêwik biêşîne. Got:

-Here hundir kuro. Ava bacanê di-nanê xwe de bide. Tu ji serê sibê ve bir-çî yî.

Piştî çend rojan Behiya bazinê xwe yê ku hêj jî bûkaniya wê ve mayî bire nik zêringê, wergerande pera. Qasid şand ji birayê xwe Elo re. Ji bo çûyîna Girnewas dest bi haziriya xwe kir. Wê êvarê berî ku bikeve xewê, ci duayen ku dizanî hemû xwendin. Ji bo ku lawîkê wê rihet bibe, hewara xwe gihande welî û nebiyan. Di dilê xwe de got:

-Xwedêyo; roja çarşemê Newas û hemû cinê din wê li hev bicivin. Dibe ku daweta wan jî hebe û bi kêf bin. Bi-

la dilovanî bikeve dilê wan, bifûre. Bi-la me bibexşînin da ku Zeynîkê min sîp û sax bibe.

Dotira rojê ereba bihesp ya mala Remoyê Bahwarî kirê kirin. Firax û mira-xên xwe û bizineke kol avêtine serê. Her sê jî lê siwar bûn. Dema ereba di nav sükê re derbas bû, wey li wî ku ti-nazê xwe bi Zeynî bike. Hemû dikan-daran ew nas dikir. Xelefê terzi gotê:

-Zeynî, ma tu ji me xeyidiyê, tu dê bi ku de herî?

Zeynî di erekê de rabû ser piyan, ba li kirâsê wî dixist. Kirâsê wî dinepixî. Got:

-Na lo, ez nexeyidîme. Li ba Morîz erekbeyek xera bûye. Şofêr tune, ezê herim bînim.

Sagirtiyê terzi xwe avête ser erekê û gotê:

-Teredîno, tu ji ku dizanî erekê ba-joyî.

Sagirt tilîka xwe danî ser nermika serê Zeynî û gotê:

-Heke tu şofêr i ereba bihesp bajo:

Dema ku sagirt tilîka xwe danî ser nermika serê Zeynî, bi meqamê qornê:

-Dîtt, dîtttt. In inn, innn, rî bidin, qemyon hat. Fiirrr... got

Diya wî bi awayekî ku dêhna xwe nediyê li wan temaşê dikir. Hişê wê li ser Mîrê cinan bû. Di dilê xwe de digot: "Wele ev çend e ku min ava germ bê bismila nerijandiye û min pelê pîvazê ji tu caran neavêtiye sobê. Her çiqas em 'ji me çêtiran' nebînin jî, ew me dibînin. Dibe ku hay ji min hebin û Zeynî bibexşînin."

Erebe ji nav bajêr derket. Çend erebeyen din jî tijî jin û zarok ber bi Girnewas ve diçûn. Jinê edrok, zarokên ku felcê li wan xistibû û hwd.

Hesp ji nişka ve herimî. Bahremo çend qamçı lê dan. Hesp çargavkî bezi. Kêfa Zeynî pir xweş bû. Devê wî gaze-kê ji hev vebû.

Wexta ku Behiya gehîst ba Girnewas, çavên wê çûne nav serê wê. Bi awayekî ecêbmayî, laşê wê bû wek cemedê, xwîn ji laşê wê vekişa. Darêni ku li ser gir bûn, tev de hatibûn birîn. Gir hatibû kolandin, bûbû wekî çaleke avê. Cîbeke plaqa wê fermî li ber çem sekinibû. Çend kesen ku şew-qeyen selikî li serê wan û bi pantore kurt bûn û du heb ji wan jî bi berçavk, kûzék li ber xwe danibûn pir bi dîqet lê dinînî.

Ew girê ku di dilê Behiya de pîroz û bitilsim bû, niha bûbû çalek. Ne darêni ku bi terişen rengin hatibûn xemilandin û ne jî li binê daran merşen raxistî hebûn...

Behiya ji xwediyê erekê re got:

-Sibe serê sibê bi me ve were. Nîvê heqê wî dayê. Elo bizin ser jêkir û bi dara tuyê ve daleqand. Dawî ji gurand.

Şeveke tijî stêr bû. Dengê beqan sisirkan û xuşîniya avê, bayê hênik û

# Hinek berhemên nûderketî

**V**an salêن dawî di cîhana weşanxaneyên kurdan de livînek û tevgîreke berbiçav tê ditin. Heger gotin di cihê xwê de be, em dikarin bi hêsanî bibêjin ku weşanxaneyên kurdan, digel bi pêşdeçûneke giran û hêdi jî, roj bi rojê pêngavêن berkeftî diavêjin.

Her çende piraniya van berhemên ku têne weşandin ne bi zimanê kurdî, bi zimanê tirkî, farisi, erebî bin jî, lê naveroka van berhemên ku ne bi zimanê kurdî ne, tev li ser doza kurdî û çareserkirina arişeya kurdî hatine amadekirin.

## Weşanxaneya Nûjen û berhemên wê

Vê weşanxaneyê, ji roja ku dest bi jiyanâ xwe ya weşanê kiriye, ci bi zimanê kurdî û ci bi tirkî, gelek berhemên hêja pêşkêsi xwendevan û xemxurên doza kurdî kiriye. Ji van berheman ên ku niha li ber desten me amadene ev in:

### 1. Amlar. (Le bîrewerekanim)

Ev berhem, ji layê siyasetmedar û nivîskarê kurdperwer Refiq Hilmî ve, di destpêka salêن 1950'yi de hatiye nivîsin. Ev pirtûka ku ji bîranînen nivîskar pêk hatiye, weki sê pirtûkan li pey hev û bi kurmanciya jêrîn yekemîn car her di salêن 1950'yi de li Silêmaniyê hatine weşandin û Ji layê xebatkarêن Weşanxaneya Nûjenê ve di yek pirtûkê de hatine komkîrin û ev pirtûk di sala 1994'an de bi zimanê tirkî li jér navê "Anilar" hatiye weşandin.

Ev pirtûka ku ji 6 beşan pêk hatiye, ji layê naverokê ve gelekî têr e. Nivîskar



Refiq Hilmî, li ser rûdan û buyerên destpêka sedsalâ bîstan û li ser leyistikên weletân Rojava ên li ser Rojhilata Navîn bi gişî û bi taybetî jî li ser arişeya kurdî bi hûrbînî rawestiyaye.

Nivîskar, bîranînen xwe yên li ser tevgera Şêx Mahmûdê Berzencî, egerên serkeftina kemalîstan û têkiliyên wanên digel emperialîstan bi zimanekî şayik û vekirî li ber çavan radixe.

### 2. XX. Yüzyıl Başlarında Kürt siyâsası ve Modernizm.

(Di destpêka sedsaliya bîstan de siyaseta kurdî û modernizm)

Ev pirtûka ku ji du beşen berfireh û ji 182 rûpelên mezin pêk hatiye, ji layê nivîskar Hasan Yıldız ve hatiye amadekirin û di payiza 1996'an de ji layê weşanxaneya Nûjenê ve du caran hatiye çapkirin.

Nivîskar, di pirtûka xwe de li ser rabiûria gelê kurd û li ser egerên têkçûna serîhildanêن wan ên di dema Osmaniyan de û li ser siyaseta Osmaniyan ya Rojhilat bi hûrbînî rawestiyaye. Bi kurtayî, li gorî dîtin û daxuyakirina nivîskar, egera têkçûna serîhildanêن kurdan ên di van heftê salêن dawî de, nebûna serperiştiyeke modern e û disa li gorî nivîskar, heta bi iro jî, bizava gelê kurd negehiştiye serperiştiyeke modern!

## Ji weşanxaneya Nûdemê...

### 1. Hingê

Li Bakurê Kurdistanê gava ku helbest, an ji helbesta serbest têgotin, yekser navê Mamosta Rojen Barnas bi pêş de tê. Bi rastî ji helbestvaniya Mamosta Barnas cihê pesindariyê ye, lê min bawer nedikir ku weki ristina helbestê wisa ci-

wan kârîbe çirokan jî darêje.

Ev pirtûka (Hingê) ku digel pêşgotina nivîskar ji 6 çirokên nîvçê pêkhatiye, ji layê weşanxaneya Nûdemê ve di sala nû (1997) de, li Stockholmê hatiye çapkirin.

Hêjayî gotinêye ku tevaya çirokên di vê pirtûkê de, digel hebûna hinek kêmâsiyên rêzimanî û bikaranîna devokê hêremkî (bixurtî), disa bi wî zimanê Rojen Barnas yê rewan û gelêri hatine darijin.

### 2. Şerefa windabûyi ya Katharîna Blum

Ev pirtûka nivîskarê Almanî Heinrich Böll ku ji 140 rûpelên normal pêkhatiye, ji layê Şahînê Bekirê Sorekli ve, ji zimanê Almanî bo zimanê kurdî hatiye wergerandin û her di vê sala nû de ji layê weşanxaneya navbirî ve hatiye çapkirin.

D.S. TIZYANI

## Mentelîta Xerab

MAZHAR GÜNBAT



**B**erî du salan di pey civîneke generalên tirk re, ji nişka ve bi daxuyaniyeke fermî. Newroz, weke cejneke tirk hate îlankirin. 'Newroz a tirkan e û ewê herdem tirk bîmîne!' gotin. Ji wê rojê ve tewra qeleşorê tirk jî bi siyaseta dewletê re hate guhertin û ewen ku heta wê rojê hebûna Newrozê qebûl nedikirin, ji nişka ve xwe kirin xwediyê Newrozê.

Ji herkesî bêhtir xwendevanên tirk bi van nivîsandinan şaş dibûn. Weki ku ji xwe bipirsin; ka ev cejn ji ku derket û kengê bû ya tirkan?! Hinek ji wan dibêjin "Weki ku ev cejn a me bû, cîma heta niha haya me jê tunebû û heta berî bi du salan jî rayedarên dewletê ev cejn tevî rengên ku sembola wê ne; qedexe dikirin û hwd.

Ev cejn di destpêkê de ya kurda bû, a tirk a bû an jî ya gelekî din bû? Esas, zêde ne pêwist e ku kurd li ser akêbûna Newrozê bi rayedar û qeleşorê dewletê re bikevin nav guftûgoy-an.

Eger bersivên kê çawa nêzîkê Newrozê dibe û bûye, tewra kê li hemberî vê cejnê çawa bûye û kî çiqas li gorî naveroka wê lê xwedî derdikeve, bên dayîn, hingê bersiva pîrsa 'Newroz a kê ye jî', ji xwe re derdikeve holê.

Li gorî agahiyê dîrokî an jî mîtolojîk, berî 2700 salan şeva 21'ê adarê li serê çiyayê bilind ên Kurdistanê an jî yên welatekî rojhilata Navîn (hûn kîjanê dixwazîn bîla ew be), bi pêxistina agirê azadiyê Newroz dest pê dike. Cih, nav, mîjû û awayê rûdana vê bûyerê, li gorî dîrokzan û çîrokbehêن gelêri biguhere jî, naverok û wateya Newrozê ji bo hemû gelan eyîn ye. Agirê ku di 21'ê adarê de tê pêxistin mîzgîniya hişyarbûn û serhildana gelên bindest li dijî zordestiya kedxwara ye.

Kawa û Dehaq, du hêman û nûnerên bingehîn in ji bo rûdana Newrozê. Yek jê evîna gelan û daxwaza azadiyê, yê din jî zordestî û kedxwariyê temsîl dike. Yek jê alîgirê meşa mirovahiyê, yê din astenga li pêsiya vê meşê ye. Tevî vê yekê, serokê azadîxwazan, Kawayê hesinkâr di bûyerê de xwedî roleke sereke be jî, sebebê bingehîn ê bûyîn û qewimîna Newrozê Dehaqê mejîxwur e. Ji ber vê yekê dema behsa vê bûyerê bête kirin, li tenîş navê Kawa, bîvê nevê, bi xerabî be jî, wê navê Dehaq jî bibore.

Niha yek rabe bipirse, 'Newroz cejna Kawa

ye an ya Dehaq e?', hûnê ci bersivê bidin vê pîrsa ku hişê mirovekî normal nikare qebûl bike?

Guftûgoyen li ser akêbûna Newrozê ji hinek dişibin vê pîrsa li jor. Ji ber ku Newroz çawa berî 2700 salî ji ber zilma Dehaq rû dabe, iro jî ji cejneke normal bêhtir bûye roja geşkirina agirê serhildanê li dijî zordestiya dewleta tirk. Eger yek bikare bibêje 'Newroz cejna dewleta tirk e', dikare bibêje ew ya Dehaq e jî. Ji ber ku Newroz ji aliye mirovî, wîjdanî û maf ve, ci qas a Dehaq be û rola wî di vê bûyerê de ci be, ew çend a dewleta tirk e û rola vê jî mîna rola yê din e.

Ji aliye şeklî ve di navbera wan de cihêregî hebin jî, mentiq û nêzîkahîya wan a ji bo azadiyê ji hev ne dûr e. Li hemberî serhildana gelan û daxwazîn mirovan ên ji bo azadiyê em nizanîn sicîla Dehaq an jî ya rayedarên dewleta tirk zêde reş e, yanê ku yekî ji wan mejiyê mirovan xwariye, yê din jî ji guhû û tiliyên mirovan koleksiyonan çê dike, bi kurtî dibe ku awa û teknîk, kuştin û işkeniceyên wan cihê bin, lê belê ev yek ji xwe ji aliye awira mirovahiyê ve, di giştîya talî de ye, ji ber ku li vir tişte girîng mentelîteye û di gelek bûyeran de baş diyar dibe ku ew her du bi mentelîta xwe pir nêzîkî hev in.

# Ehe, tir li ku, das li ku?!

**N**ûçeyekê rojnameya Turkish Daily Newsê ev gotin anî bîra me. Ev gotin di pêkenokeke gelêri de derbas dibe, mebest jê nişandana du tiştên bêeleqe ye. Di zimanê tirkî de gotineke ji bo vê rewşê heye. Dibêjin: "Dam üstünde saksagan, vur beline kazmaya" (Yanê li banî qıjak, koling li pişt xe). Nûçeya rojnameya Ilnur Çevik, ku bi objektifiya xwe pesnê xwe dide jî bi vî rengî ye.

Sernavê nûçeyê "Di operasyoneke leşkerî de 23 endamên TIKKO (Artêşa Rizgariya Karker û Cotkaran a Tirkîye-yê) hatin kuştin" dibêje. Lê di nava nûçeyê de mirov careke din rastî navê vê rêxistinê nayê. Li gorî vê nûçeyê li Gêxiya Çewlikê 16 û li Çemîsgezaka Dersimê 7, bi giştî 23 gerîla hatine kuştin; di şerê hêzên dewletê û hêzêr PKK'ê de. Heke mirov li gorî mantiqê nûçeyê here, li van her du cihan di navbera hêzên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer derketiye, lê 23 endamên TIKKO hatine kuştin.

Tê zanîn ku rojnamegerên tîrk nûçe-yêñ xwe yên li ser şerê Kurdistanê ji daxuyaniyêñ Rêveberiya Herêma Ne-asayı digirin. Lê-wisa xuya ye ku nikarin wan daxuyaniyan jî bikin nûçe,



wan dihetikînin. Êdî ji hetikandîna tiş-  
tekî.hetek, ci tişt derdikeve rastê em ji  
nizanin. Lê wisa xuya ye ku stûna pozê  
wan geleki saxlem e.

Rast e ji daxuyaniya aliyekî şer, nû-çeyên dirust ên şer dernakevin, jixwe-daxwaza çapemeniya tirk a ji bo nivisi-na nûçeyên objektif jî nin e. Heke hebûya vî şerî qirêjî ew qas dom nedikir û

gelê tirk ev qas nediket bin bandora şo venîstan. Lê mîrov ji hevpîşeyên xwe hêvî dike ku qet nebe, daxuyaniyan bas bixwînin. Divê tîrsa MGK'ê û hestê şovenîsti seretayêngin ên nûçeyê bi wan nedin jibîrkirin. Me divê em b awayekî helbestî van seretayân bînir bîra wan.

*Büyera ku nû çêdibe nav lê dikan nûçe*

Dîvê tê de diyar be cih û war û kuç  
Ew tenê jî ne bes e,  
Divê bide zanîn ku serlistikvanê bûyerê  
çi kes e.  
Pêwist e bê zanîn kat û dem  
Li hev bikin, sernav û uestpêk û encam  
Hewce nake mirov biçe fergeh û kursan  
Ev pênc hêman  
Têr zanîn  
Çi be welat û ziman  
Çi?  
Li ku?  
Kîj lehengî?  
Kengî?  
Bi çi rengî?  
Lê ji van gîringtir heye hêmanek  
Ku tê de nîn e şik û gumanek  
Daxuyaniya layekî nadî rastiyê  
Lê malixerab ew ew jî rast neguhestiyê  
Xwedê aqil û fêmekî bide we  
Riya mirovahiyê bide ber we  
Li ser riya we vêxe nistik û heste  
Dev jê biqerin ev ne tu doz û mebest e.  
Biqetînin daxuyaniyên derewîn  
Bes we alast çanax û potîn  
Heta qesta we ne yar be  
Wê rojnamegeriva we her li bevar be

QELEMŞOR NÜÇENAS

**BIXELAT...**

**XACEPIRSA BIXELAT (60)**

**XACEPIRSA**

Na. Reihen folge der Buchstaben auf dem Kreis	Erste Buchstabe des Wortes	Zweite Buchstabe des Wortes	Dritte Buchstabe des Wortes	Vierter Buchstabe des Wortes	Fünfter Buchstabe des Wortes	Sechster Buchstabe des Wortes	Siebenter Buchstabe des Wortes	Acht Buchstabe des Wortes	Ninete Buchstabe des Wortes	Eltern- Vorname oder Nach- name	Eltern- Nachname
Eine alte frau die Kinder verwirrt	E	R	S	I	H	N	Y	A	O	L	D
Ein alte frau die Kinder verwirrt	Z	O	R	I	P	T	R	E	A	L	O
Ein alte frau die Kinder verwirrt	Z	A	R	A	N	N	A	N	Z	A	Z
Eltern- Vorname oder Nachname	N	I	H	I	N	A	V	A	N	A	V
Eltern- Vorname oder Nachname	K	U	L	I	A	L	A	N	A	L	A
Eltern- Vorname oder Nachname	R	R	I	N	A	S	R	U	R	Z	A
Eltern- Vorname oder Nachname	H	A	M	A	M	I	R	A	C	R	Z
Eltern- Vorname oder Nachname	K	A	M	U	R	A	N	I	Z	A	N

**Bersiva Xaçepirsa 58'an**

Xaçepirsa me bixelat e.  
Di 15 rojan de çi bersiv  
bigihijin me, emê wan  
binirxînin û bi liya piskê li 5  
kesan belav bikin. Xelata  
hejmara me ya 60'an pirtûka


KASETA KOMA AMED  
“DERGÜŞ” e

*Jerenot:*  
Ji bo ku bersiva we bê  
nirxandin, divê hûn  
“Peyva Veşarî” di nava  
quityên li bin xaçepirsê de  
binivisîn û tevî adresâ xwe ji  
me re bişinîn.



DÜMPİSS

★ Ji çeteya Yüksekovayê serbaz ji ji qaçaxçitiya narkotikê têne



## Piştrevaniya navnetewî ji bo

**Belavkarekî Azadiya Welat di televizyonan de wekî "Terorist" Li ser maseyê jî digel hin tiştên din û nûsayeke rojnameya Azadiya Welat wekî dokumanen rëxistinéké hate nışandan. Halbükî rojname li gorî zagonen Tirkiyeyê bi temamî qanûnî ye. Ji ber vê tirsandinê di destpêkê de firotina rojnameyê ku 27 hezar bû tro dakteyiye 3 hezarî.**

### Destpêk Rüpel 4

**L**i aliye dinê paradoksa herî mezin ew e ku dema hewce dike nivisên bi vî zi-mâni werdigerinîn tirkî, wergera wan jî bi piranî ji aliye polis û hin memûren ku di daireyên dewletê de dixebeitin ve tê kîrin û ev kes pir xelet wergêriya zimanê kurdi dîkin Minak "Edene dibe bajarekî kurdan" wekî "Edene bajarekî kurdan e" hatiye wergerandin (Welatî Me hejmar 6 25.1.1994 rüpel 16). Parêzere rojnameyê bal kişand xeletiya wergeranivisan, lê tu encam jê nestand.

Ji bîlî vê rewşa fermî di pratikê de asten-gîyen din giraniyeke din derdixe holê. Postexaneyen tirk rojnameyê wekî berhemekê qedexe bêqanûnî dibînin, pakêtén wê qebûl na-kin û pakêtén ku qebûl dîkin jî bi awayekî imha dîkin. Bi vî awayî rojname nagihîje destê aboneyen xwe. Ev rewş jî aboneyan ji rojnameyê dûr dixe. Li aliye din li aboneyan tadeyî û tehdît tê kîrin. Xwendevanekî rojnameyê ku mamotoye ye li Bingolê ji ber ku rojname xwendîye ji karê xwe hate avêtin, dîsa li ser belavkarekî rojnameyê navnîşanen abo-

neyen rojnameyê hatiye girtin û abone-yen rojnameyê tev girtine. Li bajarên kurdan rojnameyên ku nayêne xwes-tin navê wan ji aliye polisan ve li bayîyan tê belavkirin û ji bayîyan dixwazin ku kesen wan rojnameyan bikire nav û navnîşanen wan bidine polisan. Ji ber ku ev rewş ji aliye xwendevanen tê zanîn, dev ji rojnameyê ber-didin û bayîyen ku rojnameyê difiroşin zira-ra nefirotina rojnameyê didine ber çavê xwe rojnameyê an imha dîkin, an jî qet paketa venakin.

Roja 1.5.1996'an belavkarekî Azadiya Welat di televizyonan de wekî "Terorist" Li ser maseyê jî digel hin tiştên din û nûsayeke rojnameya Azadiya Welat wekî dokumanen rëxistinéké hate nışandan. Halbükî rojname li gorî zagonen Tirkiyeyê bi temamî qanûnî ye. Ji ber vê tirsandinê di destpêkê de firotina rojnameyê ku 27 hezar bû tro dakteyiye 3 hezarî. Tevî ev firotin li Tirkiyeyê nîzî traşa weşanen din ên hefteyî be jî pêkûtiya li ser rojnameyê bi awayekî xwe dide nîşan.

Piraniya nivisên di Azadiya Welat de li ser çand û huner, şano, sinema û edebiyatê ne. Di firmeha 1996'an de belavkarekî rojnameyê ku 17 salî ye hildane binçav û bi meto-

## Azadiya Welat

da 'hilavestika filistinê' işkenceyê pê dîkin, jê dixwazin ku bi wan re hevkariyê bike û na-vê kesen ku cûne ciyê bide wan.

Di konferansa HABITAT ll'yan, di buroşûra ku hatiye belavkirin de navê Azadiya Welat heye û weşan wekî weşeneke nîzî PKK'ê hatiye binavkirin. Di eynî wextî de weşana rojnameyê di buroşûre de wekî nîşana demokrasiya Tirkiyeyê nimandin. Dewlet ji aliyekevi ve hebûna rojnameyê ji bo politika-yen xwe bi kar tîne, dixwaze nîşanî raya giş-tî ya dînyayê bide ku ew çiqas ji pirsgirêka kurdi re vekirî ye. Ji aliyekevi din ve jî bi ted-bîrên ku girtina rojnameyê di piş deriyen gir-tî de dibe iflasê û xwendevanen rojnameyê yê berdeweam bi derew û pêkûtiyan ji rojnameyê dûr dixe, ji belavkirina rojnameyê re astengiyan derdixe û bi aweyekî hostayî pê propogandayê dike. Di buroşûra ku navê wê li jor derbas dibe ev hevok bi ber çavê mirovan dikeve "Ji weşanekî kurdi re hewcedarî nîn e, bê eleqebûna xwendevanen jî jixwe vê nîşan dide."

Ji ber vê rewşa tenezar Azadiya Welat di firmeha 1996'an de mecbûr ma ku demekê navber bide weşanê. Heke dewleta tirk di ras-tiyê de humetê nîşanî qanûnen navneteweyî bide rojname bi hêsanî dikare derkeve û bi alikariya xwendevanen xwe bi xurtî li ser piyan raweste.

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayincılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

**NAVNİŞAN**  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
**TEL-FAX**  
(0 212)  
251 90 13

Gerinendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMÎ TAN

Berpirsê Karê-n  
Nivisaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpirsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHIR ELEDER

**ÇAPXANE**  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.S.

**BELAVKIRIN**  
BİRYAY Dağıtım

**NÜNERİTYEN ME**  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimînendeyê Giştî  
yê Ewrûpayê:  
M. Rojava

Suriye: Jan Dost  
Helifm Yusiv  
Berlin:

Silêman Sido  
49-30-69002695  
Hannover:  
Selim Biçük  
49-5721-81360

Munchen:  
Mâhmut Gergerli  
49-871-670884

Brukسل:  
Medenî Ferho  
32-02-466037  
Stockholm:  
Robin Rewsen  
46-8-7510564


Bonn:  
Ahmet Baraçlıç  
49 228 66 62 49  
Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36

## Ferhengok

kind: zilet, esaret, serşorî  
mêjû: dîrok, tarîx  
noker: xulam, sapan  
pirîsk: zerre (zerrecik)  
qaşo: goya, xwedêgiravî (sözde)  
rabûrî: çûyî, mazî  
revendî: koçer  
rewîş: ahlaq, sinc  
rewneq: al (sancak)  
rêbaz: tradisyon (akım)  
rêje: nîşbet, kelij  
rêpîvan: meş û rêveçûn  
sermedî: timî, ebedî

serperişti: rêberî, pêşengî  
stûr: qalind (kalın)  
sûd wergirtin: İstifadekirin  
sar: bajar  
Şayik: rewan, hilû  
şikeva: hevîrê bi havê  
şevezengî: reştarî  
tekûz: tam, bêkêmanî, saxlem  
tenanet: bi tenê  
teyisandin: biriqîn (parlama)  
vemayîn: dereng mayîn  
vemayêن we: dûvajoyêن we  
xoşdîvî: xoşewîst, delal, eziz  
yarîgeh: qada lîstinê  
zêrevan: nobedar

akêbûn: malê kê  
arîse: pirsgirêk, kêse, problem  
bizav: tevger (hareket)  
cirnexwêş: herimî (huysuz)  
dérînî: esalet  
dirûv: xuyang (görünüş)  
diyarî: xelat (hediye)  
elend: berbang, berbeyan, şefeq  
fêrgeh: dibistan (okul)  
ginewas: ziyareteke li Nisêbinê  
gorepan: meydan, qad, meydan  
gopîtk: zîrve, lütke  
hevpîse: kesen ku eynî karî dîkin  
hindikahî: hûrnetewe, (egalite)  
kendav: xelic (körfez)



# Jenâma Helebçeyê ethnosîda îser kurdan

"Li Başûr serokatî girêdayî eşîretê ne. Serokatiyê bi vî rengî nikarin doza xwe bi raya giştî ya cihanê bidin pejîrandin." Her wiha rayedarê HADEP'ê Mahmut Can bi bîr xist ku rejîmên fasîst na-hêlin ku gelên cihanê bi sû-cênen wan bihesin. Digel vê yekê wî got ku rêxistinê gel bi polîtikayê xwe girêdayî hêza gelê xwe bin. Di dawîya axaftina xwe de Mahmut Can wiha got: "Ji bo ku Helebçeyê din neyê serê gelê kurd gerek mafêن xwe yên demokratik û statûyeke federalî bi dest bixe."

## Hişmendiya kurdayetiyê girîng e

Nivîskar û rojnamegerê kurd Faik Bulut jî, li dijî rejîm û sedemên sernekeftina kurdan nêrîn xwe anî ziman û got: "Dîroka me bi aliye kî xwe dîroka serhildanan e, bi aliye kî jî dîroka îxanetê ye. Her wiha jî dîroka me dîroka kesen eslê xwe nizanin e." Bulut diyarkir ku kurd ji riya mirinê vegeiyane, ev şense wan ê talî ye.

Cavdêriyên xwe bi gotinê li jorê anî ziman rojnamegerê û xwediye pirtûka "Sessiz Tanık" Ramazan Öztürk, di panela roja salvegera 9'an a Qetliama Halabçeyê de. Ev panel roja 16'ê adarê li HADEP'a Bağcılarê hate lidarxitin. Ramazan Öztürk axaftina xwe bi van gotinan qedand: "Li gorî doktorê İranê ku kesen birîndar mueyene dikirin, digotin ku ev mirovên birîndar ger ji mirinê xelas bibin jî wê seget bimînin." Dîsa li gorî gotinê Ramazan Öztürk, Tirkîyeyê di vê mijarê de li nik Saddam cih girtibû. Heta di şerê Körfezê de hîn birîndar ji layê hemşireyên tirk ve dihatin derman kîrin û rayedarekî tîrkan digot: "Di nav van de yên ku bi bomyêñ kîmyewî birîndar bûne tune ne." Her wiha Öztürk da zanîn ku vê daxuyaniyê hineki be jî Saddam ji súcdariyê xelas kiriye û ançax Qetliama Helebçeyê piştî şerê Kendavê hatiye rojeva cihanê.

**Faik Bulut got:** "Dîroka me bi aliye kî xwe dîroka serhildanan e, bi aliye kî jî dîroka îxanetê ye. Her wiha jî dîroka me dîroka kesen eslê xwe nizanin e." Bulut diyarkir ku kurd ji riya mirinê vegeiyane, ev şense wan ê talî ye.

bistanêñ herêmî yên bi şev û roj (yatılı okul) ku tê de zarok bi zimanê zikmakî perwerde bibin pêwest in. Her wiha Seyid Riza hê di sala 1937'an de ev daxwaza pir girîng anîbû zîmîn û gotibû ku 'mirov divê ji layê kulturî ve nayêñ asîmîlekirin.'

Bulut bi bîr xist ku li Kurdistanê gelek tevkujiyê wekî tevkujiya Helebçeyê dîtiye jî li ser sedemên qetliamê rawestîya Işık da xuyakirin ku gava li İranê komara İslâmî ava bû, dewletên rojavayî ew ji xwe re wekî tehdît dîtine û alîkarîya Iraqî kirine. Fehim Işık bi bîr xist ku Saddam hemû çek ji Almanya û Dewleten rojavayî standine.

Faik Bulut li ser Helebçeyê jî ev got:

"Bi qetliama Helebçeyê mejiyê me bombe kirin. Saddam li Sulêmaniye mizgî çedîkir û li ser navê din 'siyaseta mizgîtan' dîkir. Bi vî awayî gelê kurd asîmîlî dîkir. Niha jî Refah wisa dike."

Helebçeyê, mirovîn ku li Çulemergê û navâ çopê de li pariyek nan digerin, helebçeyê û mirovîn ku li Amedê di nav pîrik û heriyê de ji xwe re pariyek (gepik) nan didin hev ne dûrî hev in.

Faik Bulut axaftina wiha qedand: "Rastiyek kurdan jî girîngiya serokatîye. Hemû mercen erêni û neyîni ku kurdan di jiyanâ xwe de biheriyê di sala 1984'an de bi hemû taybetiyê xwe ve derkete holê. Divê mirov li dema niha binêre û ji dema borî dersan bigire." Dûrî nivîskar, bal kişand ser rewşa kurdan a li Rojhilata Navîn û got: "Ger ku meseleya alê nebûya iro li Rojhilata Navîn tenê wê gotin li ser "Susurluk û pîrsîrîka kurdan" bûya û dewletên rojava bêhtir wê giranî bidana ser pîrsîrîka kurdan û bi ser dewleta tirk ve biçûna." Li ser pîrsîrîka Bulut bal kişand pêwestiya "hişmendiya kurdayetiyê" û got: "Di nav heriyê de berhevkirina nan çî ye? Di vir de, girîngiya hişmendiya kurdayetiyê xwe di de xuyandin. "Ez kurd im, lê tirk im" heya ev mîjî neyê guhartin, em tiştekî bi dest naxin." Faik Bulut diyarkir ku ji bo serkeftinê rêxistineke modern û arteşike modern pêwest bûye û ew rêxistin û artesî jî piştî 1984'an derkete holê.

Ji Enstituya Kurdi Mevlüt Çetinkaya, bi van gotina dest bi axaftina xwe kir. "Wê demê ji aliye têkoşîna neteweşî ve hin herêm wekî "Herêmên Xilasbûyî" hatîbûn îlankirin. Helebçeyê jî berî ku wê tekeve nav "Herêmên Xelasbûyî", ji aliye Seddam ve û bi hevkariya komara tîfî qetliam hate kirin." Çetinkaya da xuy-

## Roja wehsetê

**d**i sala 1988'an roja 16'ê adarê de min ji ajansêni biyan nûçeyâ Qetliama Helebçeyê bîhist û ez çûm bajarê Helebçeyê. Wê rojê hîn bombebarana hewayê de-wam dîkir. Çawa ku mirov dikete hundi-re, bajêr didit ku hemû tiştîn zindî mirine, tenê firaq miraq mane.

Di vê wehsetê de 4 cure bombeyen kimwewî hatine bikaranîn (yên ku organen hundîrîn û mirov parça dîkin, yên hisê mirov ji serê mirov dibin ....) Bi pîrani zarok û jin bûn ûn ku hatibûn kuştin. Her wekî cihûyên ku di destê nazîyanî di hundîrê odayê gazê de bi hev re dihatin kuştin, li vir jî hinek mirovan ji bo ku hev û din biparêzin û wekî çareyeke xelasîyê hev û du hembêz kiribûn. Gava ku bombeyen kîmyewî diavêjin nav insanan, bêhna wan diçike bi hev ve hildikişin ber bi jor de ji bo ku bêhnê bistînîn, wisa li ser hev bi komî hatibûn kuştin.

Hin jê li ser xwarinê ketibûn, hin za-rok jî çenteyê wan ê dibistanê di destê wan de bû, dema ku diçûn dibistanê di rî de miribûn. Dê û bavan zarok hembêz kiribûn lê ew jî xelas nebûbûn. İnsanen ku ji bajêr xwestibûn birevin derkevin, li serê rî miribûn, wekî zeviye ji insanan bû. Yê ku xelas bûbûn çend kes bûn û wan jî xwe di bodrûman de parastibûn."

## Mafêن demokratik û federasyon

Ji besdarê panelê rîveberê HADEP'a Stenbolê Mahmut Can jî li ser dîroka qetliamê sekînî û bal kişand ser hînek mijaran. Li gorî Can ji bo ku gelê kurd birûmet bijî, pêwest e, ew hînî politikayê bibe û sedema biserneketina gelê Başûr bizane. Mahmut Can wiha axivî:

kirin ku hin xayînêñ mîli yên li Kurdistanê jî alîkarî kirine; her wiha mijokên ku li Kurdistanê dijîn bi saya serê van dijîn. Di dawîye de wî xwest ku kurd çarenta xwe bi destê xwe binivîsin.

Gérinendeyê Weşanê yê Rojnameyê Hêvi Fehim Işık jî ku Qetliama Helebçeyê dîtiye jî li ser sedemên qetliamê rawestîya Işık da xuyakirin ku gava li İranê komara İslâmî ava bû, dewletên rojavayî ew ji xwe re wekî tehdît dîtine û alîkarîya Iraqî kirine. Fehim Işık bi bîr xist ku Saddam hemû çek ji Almanya û Dewleten rojavayî standine.

SEWDA ELDEMİR